Awaza bilûra Xecê...

Di gelek çandên cihê de bilûr xwedî cihek girîng e. Herî zêde jî di demên berê de, bi hezarê salan beriya wê li gundan, li şevên sar ên zozanan, nexasim jî dema bêriyê dihat lêxistin û wek amûrek şivanan jî hatiye nasîn, bi wan re bûye yek perçe... *Zehra Mohammedzadeh R.2*

Çima dinivîsim?

Gotina "çima tu dinîvîsî?" her çiqas pir hêsan bixuye jî, yek ji pirsên herî zehmet e. Çima ez dinivîsim? Çima min nivîsand? Çima min bi kurdî nivîsand? Ma mamosteyê min ez teşwîq kirim? Na!.. *Firat Cewerî / R.5*

Her roj roja ziman...

Li welatê me û bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê serdemeke tije tirs a tunekirina nirxên ku nasname û mayîna me bi wan ve girêdayî ye, êdî gehiştiye xêzên sor ên sînorê xwe! Dijmin ji hêlekê bi hêza aborî-siyasî û ji hêla din jî bi rêya teknîka ragehandinê... *Kakshar Oremar / R.8*

Rojnameya Heftane

xwebûn

31 Tebax-6 Îlon 2020

Hejmar:37

Buha: 4 TL

www.xwebun.org

rojname@xwebun.org

"LeYLaN" Mistdana Ruhê Civakê ye

Wext tê û mirov li kodên ruhê xwe yê cîvakî rast tê û êdî naxwaze wan kod û şîfreyan ji bîr bike… Hostetî û şarezatîya nivîskar, di berhemê de parzûnkirinek e. Ew huner e, guhdarîkirina li dengê dil û dengê ruh e. Romana Devliken Kelogirî ya bi navê "LeYLaN" yek ji wan berheman e ku bi xwendineke ji dil xwîner didin pey dengekî gelekî henûn, didin ser şopa rûyekî gelekî nas... *Sîdar Jîr / R.11*

Bişaftina berîya Y'yê

Li bakurê welêt, bişaftin hatiye qeysa xetereyê. Hîn jî êrîşên bişaftinê bi awayekî xurt didomin. Heger li vî parçeyê welêt, di demeke nêz da zimanê perwerdeyê nebe kurdî, ew ê êdî pirr dereng be...

Pêşî bibêjim li ser rêzimên napeyvim û ne hedê min e lê hezar mixabin ku kurdî xwe ji dorpêçkirina rêzimana kurdî xelas nake û cewhera meselê nayê nîqaşkirin. Bi qasî ku Î'ya berîya y'yê tê nîqaşkirin, ewqasî bişaftin û qirkirina çandî nayê nîqaşkirin...

Bi kurt û kurmancî beriya Y'yê divê têkoşîna li dijî pergala qirkirina çandî û bişaftinê were, yan na ew ê Y'yek ku em ê li ser bipeyvin nemîne... *Helîm Barîn RÛPEL - 5*

Wa merg biqedîyo...

Xebera şehadetê Ebruye de mektuba aye ame mi vîr. Ebru Tîmtîke zîndanî ra pê serrnameyê 'Mi bêrîya Dêrsimî kerde' mektubêk erşawitbî. Tîmtîke mektuba xo de wina vatbî: "Eke ez bêra veradayene, ez cade şona Dêrsim. Heta ke ez nêşora ewja, ez weş nêbena. " ... *R.9*

Zimanê serdest dikuje!

Mamoste û nivîskar Amed Tîgrîs têkildarî jiyan û serpêhatiyên xwe axivî. Tîgrîs li ser perwerde û rewşa zimanê kurdî jî nirxandinên hêja kir. Tîgrîs destnîşan kir ku rizgarbûna zimanê kurdî bi perwerdeya sîstema dibistanan ve girêdayî ye. Tîgrîs wiha dibêje: "Perwede bi awayekî fermî di dibistanan de tune, di demeke dûr û dirêj de zimanê serdest zora zimanê axaftinê dibe û dikuje. Wê demê polîtîka asîmilasyona dewletê bi ser dikeve"... *Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R - 4*

Bi projeyeke nû li ser dikê ne

Şanoya Bajêr a Amedê jî ji ber şewba koronayê demeke dirêj navber da kar û xebatên xwe yên li qadan. Li ser medyaya civakî bi qasî derfetan xwe gihand temaşevanên xwe. Şanoyê piştî ku rewş asayî bû xebatên xwe dîsa berdewam kir û niha bi projeyekê amadekariya bernameyeke nû dike. Şano xwe amade dike ku bernameyeke skêçan li ser ekranên televîzyonan bide weşandin... *R.11*

Di gel de hêza berxwedanê heye

Dewleta tirk bi hemû hêza xwe dixwaze îradeya gelê kurd binpê bike. Ji bo vê jî çi ji destê wê tê texsîr nake. Li hemberî van êrîş û zêxtên dewleta tirk gelê kurd bi îradeyeke mezin li ber xwe dide. Lê mixabin ev berxwedan û tekoşîna gelê kurd ji nedîtinê ve tê... Têkoşîna gelan ger xwe li ser hîmekî rast rêxistin bike û hêza xwe ya berxwedanê bike yek wê bikaribe van êrîşan bişikîne û vê siyaseta pûç têk bibe... *Felemez Ulug / R.7*

Ti nameyê pêyxamberê axir zemanî hesîyaya pê? Mehmet Seyîtalîoglû / R - 9

Ev dijqanûnî ye

Ji 17'ê tîrmeha 2019'an ve li hemberî Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) ambargoyek heye. Endama Dîplomasiya Jinan a Kampa Mexmûrê Leyla Arzû Îlhan da zanîn ku biryara ambargoyê ne qanûnî ye... *R.7*

Gemara 5 hezar salî

Van rojan bi taybetî li Kurdistanê bûyerên herî zêde diqewimin û mijara ku herî zêde li ser tê nîqaşkirin, tecawiz e, çanda tecawizê ye. Bi taybetî piştî xwekuştina jina ciwan Îpek Er ku rastî tecawiza çawişê pispor Mûsa Orhan hat û parastina çawişê pispor a ji aliyê rayaderên dewletê ve, ev mijar ket rojeva jinên kurd. Lê belê çanda tecawizê çi ye û çawa li nav civakê xwe da der? Divê beriya her tiştî ev pirs bên bersivandin... *R.2*

Nehiştin dayik biaxive!

Di çend salên dawîn de, li bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê çendê carekê em bi bûyerên cihêkar ên li dijî ziman, çand û hunera kurdî dihesin an jî em bixwe rastî wan tên. An saziyên wan tên girtin, an ji ber axaftina bi zimanê kurdî heqaret li kurdan tên kirin û tên kuştin jî. Herî dawî li Êlihê Tirk Telekomê nehişt dayika kurd bi zimanê xwe biaxive... *R.3*

Gemara 5 hezar salî

Ev pergala tecawizê ku xwedî dîrokeke 5 hezar salî ye, li Kurdistanê wek şerê taybet hatiye sazkirin. Exlaqê civaka kurd bi bedena jinê tê hilweşandin. Her roj bi tecawizê civaka gelê kurd tê hedefgirtin

Navenda Nûçeyan

Van rojan bi taybetî li Kurdistanê bûyerên herî zêde diqewimin û mijara ku herî zêde li ser tê nîqaşkirin, tecawiz û çanda tecawizê ye.

Bi taybetî piştî xwekuştina jina ciwan Îpek Er ku rastî tecawiza çawişê pispor Mûsa Orhan hat û parastina çawişê pispor a ji aliyê rayaderên dewletê ve, ev mijar ket rojeva jinên kurd.

Çanda tecawizê çi ye û çawa li nav civakê xwe da der? Divê beriya her tiştî ev pirs bên bersivandin. Dema ev pirs bên bersivandin û zanîn, rê û rêbazên li hemberî van tecawizê jî dê bên zanîn.

Çanda tecawizê xwe dispêre dîrokeke 5 hezar salî. Ev çanda tecawizê ku xwedî dîrokeke 5 hezar salî ye, piştî avabûna şaristaniya Sumeran derket holê. Yanî ev çand piştî avabûna dewletan, ji aliyê zihniyeta mêran ket nav civakê.

Çanda tecawizê ji aliyê dîrokî û civakî ve xwe dispêre mêrê serdest. Mêrê serdest (piştî ji xwezaya xwe yanî ji civaka dayiksalariyê dûr ket) ji bo pergala xwe di nav civakê de ava bike yekser êrîşê pergala dayiksalariyê kir. Çimkî mêr dizanibû ku avakirina pergala xwe ya her cureyên kirêtiyê di nav xwe de dihewîne, bi têkbirina jinan pêkan e. Ji bo avakirina pergala xwe serî li her cure xirabiyê da. Yek ji wan xirabiyan jî avakirina pergala tecawizê ye.

Di esasê xwe de çanda tecawizê ji rê derketina azadiyê, tevgera derveyî xwezaya civakbûnê ye. Mêrê serdest bi tecawizê di kesayeta jinan de xwest hemû civakê bixîne. Ji bo vê jî bi her awayî êrîşî jinan kir, hem ji aliyê fîzîkî hem jî ji aliyê derûnî ve. Êrîşî hemû nirxan kir. Her tiştên ku xwe dispêre çanda dayiksalariyê bû hedefa mêrê serdest.

Divê neyê jibîrkirin tecawîz tenê li bedena jinê nayê kirin. Pergala mêr ji nirxên civakî bigire heta aborî, huner, ziman û hwd. tecawizê her tiştên aîdê civakê dike û vêya jî li ser jinê pêk tîne.

Ev pergala tecawizê ku xwedî dîrokeke 5 hezar salî ye, li Kurdistanê wek şerê taybet hatiye sazkirin. Exlaqê civaka kurd bi tecawiza li bedena jinê tê hilweşandin. Her roj bi bûyerên cuda yên tecawizê civaka kurd tê hedefgirtin.

Bi dehan salan e şerê taybet bi destê polîs, leşker, cerdevan û hwd. ên dewletê ve li Kurdistanê wek polîtîkayekê tê meşandin. Heta çapemeniya alîgir jî parçeyekî vê ye. Çapemeniya alîgir bûyerên bi vî rengî yên li Kurdistanê rewa û wek erkekî 'şerê li dijî terorê' nîşan dide. Yanî li Kurdistanê jinên kurd hem ji ber nasnameya xwe ya zayendî hem jî ji ber nasnameya xwe kurdbûnê rastî tecawizê tên.

Nexwe divê rê û rêbazên li hemberî vî şerê taybet ê tecawizê çi bin?

Divê destpêkê malbatên kurd rastiya şerê taybet bi zarokên xwe bidin nasîn. Bi taybetî divê jinên ciwan li hemberî polîtîkayên tecawizê bên agahdarkirin. Heta ev rastî baş neyê nîşandan dê têkoşîna li hemberî vê yekê gelek zehmet be. Piştî malbatê divê rêxistinê jinan ên li Kurdistanê der barê vê yekê de perwerdeyan bidin, broşurên agahiyê belav bikin. Çimkî piştî malbatê berpirsyariya herî mezin dikeve ser milê sazî û rêxistinên jinan.

Divê tu carî neyê jibîrkirin, jinên kurd li Kurdistanê tenê ji ber nasnameya xwe yên kurdbûnê rastî tecawizên rayaderên dewletê tên. Dixwazî keça cerdavanekî be, dixwazî keça leşker û polîsekî be yan keça welatparêzekî be, keça kî dibe bila bibe ji ber nasnameya kurd, jin her tim dibin hedefa dewletê.

Ji bo têkoşîna li dijî şerê taybet a tecawizê divê jinên kurd ji 7 salî heta 70 saliyan xwe ji her alî ve birêxistin bikin. Xwe û civakê li dijî polîtîkayên vê rengî perwerde bikin. Her wiha divê hemû civak xwe di vê mijarê de berpirsyar bibîne û li gorî vê berbirsyariyê tev bigere.

Zehra Mohammedzadeh

Awaza bilûra Xecê...

Di gelek çandên cihê de bilûr xwedî cihek girîng e. Herî zêde jî di demên berê de, bi hezarê salan beriya wê li gundan, li şevên sar ên zozanan, nexasim jî dema bêriyê de dihat lêxistin û wek amûrek şivanan jî hatiye nasîn, bi wan re bûye yek parçe. Bûye dengê herikîna hestan, veguheriye çandeke kevnar û dewlemend ku li zozan û geliyan deng dide. Jixwe di roja me ya îro de jî ev amûr wek yek ji amûrên girîng ên orkestrayan tê zanîn.

Çanda bilûrê li rojhilatê Kurdistanê û herêmên din ên welêt hîna bi awayekî zindî tê parastin. Nemaze ez ê îro behsa jinek bilûrvan ku jiyan û hebûna wê, eşqa wê ya jiyanê bilûr e, bikim. Jinek ji Gîlanê!

Ji bo yên nizanin; bajarê Gîlanê xwedî herêmek 14711 kîlometreçargoşeyî ye û dikeve navbera rêze çiyayên Elborz û Talêş ên dikeve bakurê welêt.

Li vê herêmê gel bi zimanên cihê diaxivin; mînak gîlek, talşî, kurd, eşîrên kevnar û hwd. li vir dijîn. Baweriyên cihê, nexasim sunî û şîe lê hene. Ji ber vê yekê jî ziman û zaravayên cihê lê tên axaftin. Mixabin gelek ji wan zimanan; mînak gîlekî di bin serweriya zimanê farisî de maye û bi helandinê re rû bi rû ye.

Xecê ku wek "Xedîcê Xalê" jî tê nasîn ji Gîlanê ye. Bi zimanê farisî qet nizane û tenê bi zimanê xwe yê dayikê, yanî bi zimanê talşî diaxive.

Helbet mijara me ne ziman e lê em ê hewl bidin bi çend gotinan be jî behsa zimanê talşî bikin. Zimanê talşî yek ji zimanên kevnar ê herêma bakur-rojavayê Îranê ye û li gor hin zimannasan ev ji zimanê farisî cihê ye lê nêzîkî zimanê medî û avestayî ye. Tê gotin şibahetek vî zimanî ya berbiçav bi zimanê lorî, avestayî û kurdî re heye. Girîng e mirov balê bikişîne ser; li gor agahiyên ez pê dizanim talşî bixwe kurd in û tê gotin ji herêma Hewramanê beriya bi hezar salî, ji ber koçan veqetîne û hatine vir bi cih bûne lê li vir nasnameya wan a kurdayetî bi awayekî ji dest wan hatiye girtin, ji bo wê jî ger bi gelemperî nebêjin em kurd in jî, her wiha qebûl nakin ku ew fars in.

Xedîcê Xalê, şêrejinek ji Gîlanê ye ku piştî mirina hevserê xwe hemû barê jiyanê hildigire ser milê xwe û têdikoşe. Ew di sala (1314) de tê dinyayê û bi gelemperî li Gîlanê her kes wê bi navê "Xecê" dinase. Hîna jî, rexmê temenê xwe yê 78 salî hildikişe ser darên gûzan û dewarên xwe ji bo biçêrîne, derdixîne derve.

Xecê jiyana xwe li gundê Cengelî Rezdar a ser bi Rezwanşehrê diborîne. Jixwe xwezaya xweş û semyana vî gundî mirov matmayî dihêle; ev xweşikî û bedewiya xwezayê jî yekser li ser hest û bilûra wê bandor kiriye. Ew dema li bilûrê dixe, dengê ji bilûra wê derdikeve bi bedewiya xwezayê re dibe yek…

Ew di lêdana bilûrê de jêhatî ye. Jixwe di gelek şahî û festîvalên herêmî yên penîr, dûşav, xwûrme û tûşêmî ku li gundên herêmê tê lidarxistin beşdar dibe û ji bo wan li bilûrê dixîne. Dengên dorhêlê, ava kanî û çeman, bi dengê dilê wê re digihe hev û li asoyan olan dide. Dibe dengek enderûn ê awaya ji dilê wê diqete û li nav xwezayê belav dibe.

Helbet girîng e ku mirov bêje ew bi hêz, bawerî û alikariya xwe bixwe, kariye bigihê vê astê û kêm kes wek wê dikarin wiha bilûrê lê bixin. Ev jina bilûrvan wê hîn di temenê xwe yê zarok de, bi qalikê darê dest bi lêdana bilûrê bide. Tişta balkêş jî ew e ku bê ku bixwîne, yan jî cem kesekê perwerde bibîne wê wiha baş fêr bibe û li bilûrê bide. Ew ê bi boriyek plastîk û bi kamiriyekê muzîka talşî a kevnar bi awayekî jêhatî û xweş lê bide, her kesê matmayî bihêle.

Jiyana Xecê di nav dilê xwezayê de ye, ji bo wê jî dema dest bi lêdana bilûra xwe dike, bi awirek kûr û dûr nêrînên wê noqî bedewiya gundê Cengelî dibe û dibêje; 'dengê pîrejinekê ku nagihe cihekê'. Ev gazin û tinaziyên wê jî diyar e ji pergala heyî re ye ku nahêle dengê wê sînorên heyî derbas bike.

Girêdana wê ya bi xwezayê re di her kêliya jiyana wê de xuya dibe; rexmê ku nobedarên daristanê israr dikin Xecê mala xwe vala bike, hîna jî li wir dijî û her carê dibêje, ez li daristanê hatim dinyayê, ez ê neçim tu devereke din û li vir jî bêm binaxkirin.

Bilûr dengê hestên Xecê ye. Ew bi rêya bilûrê derd û kederên xwe vediguhezîne dengan û aram dibe. A rast ew herî zêde bi rêya vî dengê ku ji bilûra wê derdikeve xemrevînî dibe û dikare muzîka xwe ya herêmî jî bi vî awayî zindî bihêle. Ji ber enstrumanên cihê yên di muzîka taleşî de pir sînordar in, amûra herî tê nasîn a herêmê bilûra "çopanî" ye ku bi "lelêh" bi nav û deng e. Jixwe li Gîlan û Mazenderan bidestxistina wê asan e.

Di roja me ya îro de, yek ji helbesta gelê taleş a bi navê "Memobe" (Mehmodbe) ye ku hatiye neqil kirin û Xedîce di lêdana vê helbesta talşî de xwedî jêhatîbûnek cihê ye.

Xedîce Xale ne kêmî mamoste û ostayekê li bilûrê dixe ye, dema dest bi lêdana bilûrê dike jî bi evînê nêz dibe û herkesê lê guhdarî dike, mest dibe. Wê xweşikî, dilnizmî û aramî ji xwezayê girtiye û ev aramî û xweşikiya wê di awaza bilûra wê de jî baş tê dîtin.

Ev jina hunermend a talşî, di pêvajoyekê de ku rayedar û berpirsên heyî li hemberî vê çanda dewlemend xemsar bûn, wê bi hunera xweşik a muzîka talşî a gelê xwe hesî û ji bo pêşxistina wê bi evîn xebitî…

'Hêrsa me ji êşa me mezintir e!'

Hêj zêmara dayika Îpek Er Hakîme Kiliç 'Rabe keça min rêya min dirêj û barê min giran e' li ber guhan deng dida tecawizkar Mûsa Orhan hat berdan. Jinên kurd jî li hemberî vî şerê taybet got: "Hêrsa me ji êşa me mezintir e."

Navenda Nûçeyan

Li Tirkiyeyê tundî, kuştin, tacîz û tecawiza li jinê her roj zêde dibe. Bêcezahiştina êrîşkar, tecawizkar û kujeran wekî polîtîkayeke dewletê tê meşandin. Her wiha li bajarên Tirkiyeyê û li bakurê Kurdistanê jî polîtîkayên ji hev cuda tê meşandin. Di bingeha van polîtîkayan de jî parastina desthilatariya mêr heye.

Li Bakur zêdetir ev polîtîka bi destê erkdarên dewletê tê meşandin. Li vê derê jinên têkoşer, welatparêz û bi taybetî jî jinên ciwan ên xizan hedef tên girtin. Ji salên 90'î heta roja me ya îro jî heman rê û rêbaz tê bikaranîn. Êlih di salên 90'î de wekî bajarê întîxarê dihat pênasekirin. Bûyera Îpek Er carek din nîşan da ku li Bakur heman rewş didome û asta şer tu carî neguheriye.

Îpek û Hakîme...

Îpek Er ya 18 salî li Sêrtê bi tecawiza çawîşê pispor Mûsa Orhan re rûbirû ma. Îpek serpêhatiya xwe ji dayika xwe Hakime Kiliç re dibêje. Piştre Îpek û Hakîme ji bo edalet pêk bê û tecawizkar bê cezakirin serî li dadgeha Sêrtê û Êlihê didin lê kes dengê her du jinan nabihîze heta ku Îpek întîxar dike. Ji 16'ê tîrmehê şûn de êdî her kes bi serpêhatiya Îpekê hîn bû. Her wiha Îpek serpêhatiya xwe bi nameyekê vegotibû.

'Êdî ez natirsim'

Îpek Er 34 rojan li nexweşxaneya Êlihê li ber xwe da û li derve jî dayika wê ji bo tecawizkar bê cezakirin hewl da. Ligel hewldanên her du jinan bûyer bi aşkerakirina nameyê bêtir ket rojevê. Îpek Er di nameya xwe de wiha dibêje: "Mûsa Orhan xeyal û hêviyên jiyana min hilweşandin. Canê min pir diêşe. Wî ez xapandim. Ji min re digot 'ger tiştên di navbera me de tu bibêjî ez ê te bikujim. Jixwe kes ji te bawer nake, tu bê xwedî yî. Min li gelek kesan wiha kiriye û tiştek nayê serê min.' … Jixwe êdî ez dimirim û ez natirsim..!"

'Rabe keça min..!'

Dema Îpek Er li nexweşxaneyê bû malbatê gilî kir lê dozger û serdozgeriyê ligel nameya heyî jî biryara serbestberdana çawişê pispor Mûsa Orhan da. Dayika Îpek Er di her axaftina xwe de aciziya xwe li hemberî helwesta erkdarên dewletê dianî ziman û digot: "Divê mezinên dewletê Mûsa Orhan bê ceza nehêlin. Ji ber ku ev berhema wan e. Bila vê qirêjiyê paqij bikin. Ez bang li dozgerê ku Mûsa Orhan berdaye dikim, gelo wî wisa li keça te kiriba te yê heman bertek nîşan bida...!" Di 18'ê tebaxê de Îpek Er jiyana xwe ji dest da û dayika wê bi zêmara "Rabe keça min rêya min dirêj û barê min giran e" keça xwe veşart.

Peyamek dan civakê

Li bakur, başûr û rojavayê Kurdistanê, Tirkiye û Ewropayê sazî û rêxistinên civakî û partiyên siyasî li hemberî bûyerê nerazîbûn nîşan dan û bal kişandin ser polîtîkayên bêcezahiştina tecawizkar û kujeran. Li hemberî wan bertekan di 19'ê tebaxê de çawişê pispor Mûsa Orhan hat girtin lê Orhan piştî hefteyekê careke din serbest hat berdan. Girtina wî ji bo bêdengkirina gel û serbestberdana wî jî ji bo civakê peyamek bû.

Parêzeran gilî kir

Parêzerên malbata Îpek Er, derbarê Mûsa Orhan ku sûcê 'êrîşa bi wesf a zayendî kiriye' de gilî kir û xwest Mûsa Orhan bê darizandin. Gilî bi îmzeya 11 parêzeran hat kirin û serî li Serdozgeriya Komarê ya Êlihê hat dayîn.

Ji bo dengê xwe bide bihîstin

Bûyerên bi vî rengî bi salan e li herêmê wekî polîtîkayeke şerê taybet tê meşandin. Bi hezaran jinên ciwan ên kurd bi vî rengî tên qetilkirin an jî bi tecawizê re rûbirû dimînin. Ji neçariyê yan dawî li jiyana xwe tînin an jî bêdeng dimînin lê vê carê Îpek Er ji bo dengê xwe bide bihîstin û tecawizkar ceza bigire dawî li jiyana xwe anî. Wisa jî bû!

'Doza min bişopînin'

Piştî dawî li jiyana xwe anî û dayika wê jî bêdeng nema, civak jî xwedî li wan derket. Îpek Er bi nameya xwe xwest peyamek bide jinên ciwan û xwest bûyerên ku bi salan e li herêmê pêk tên derkevin ser rûye erdê. Sazî û rêxistinên jinan jî dan zanîn ku îfadeya Îpek Er di nameyê de heye û di nameya xwe de gotiye "Doza min bişopînin", êdî ew name emanetî jinan e.

Nehiştin dayika 65 salî bi kurdî biaxive

Felat Niştiman

Di çend salên dawîn de, li bakurê Kurdistan û Tirkiyeyê çendê carekê em bi bûyerên cihêkar ên li dijî ziman, çand û hunera kurdî dihesin an jî em bixwe rastî wan tên. An saziyên kurdan tên girtin, an ji ber axaftina bi zimanê kurdî û guhdarîkirina li muzîka kurdî heqaret li wan tên kirin û her wiha tên kuştin jî.

Ji serê sala 2020'an heta niha çend pêkanînên li dijî zimanê kurdî:

-Ciwanê bi navê Bariş Çakan li Enqereyê ji ber li muzîka kurdî guhdarî kir, ji aliyê sê nijadperestên tirk ve bi kêran hat kuştin.

-Qeyûmê li ser şaredariya Sêrtê pirtûkxaneya bi navê Celadet Elî Bedirxan xera kir.

-Kêlên goran ên nivîsa kurdî li ser wan hatin xerakirin.

-Qeyûmê li ser şaredariya Êlihê nivîsa bi kurdî ya li ser rêya wesayîtan a ji bo peyeyan jê bir.

-Gelek qeyûmên li ser şaredariyên bakurê Kurdistanê, xebatên ziman, çand û hunera kurdî yên bi destên şaredariyan dihatin kirin bi dawî kirin; tabelayên bi kurdî ji şaredariyan daxistin û navên kolanên bi kurdî guhertin.

-Li Zanîngeha Dîcleyê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî teza bi zimanê kurdî hat qedexekirin û li xwendekaran nivîsîna teza bi zimanê tirkî hat ferzkirin.

-Li navendeke danûstandinê ya li Cizîrê axaftina bi kurdî li xebatkarên navendê hat qedexekirin.

Bêguman sedema van pêkanînan, polîtîkayên dewleta tirk ên yekperest û asîmilasyonîst ên li hemberî kurdan e. Çi sazî û dezgehên dewletê û yên taybet, çi jî kes û komên nijadperest ên tirk, li hemberî kurdan, çand û zimanê wan li gorî polîtîkayên dewletê tevdigerin. Mînaka vê ya herî dawîn, şîrketa xeta telefonê Turk Telekom e.

Hefteya borî, ciwanê bi navê Omer Başaran ê ji Êlihê, li ser hesabê xwe yê tora medyaya civakî (twîtter) der barê helwest û nêzîkatiya cihêkar a li dijî zimanê kurdî ya xeta telefonê Turk Telekomê de rêzetwîtek (flood) parve kir.

Başaran li ser hesabê xwe diyar kir ku wî xwestiye xeta telefonê ya li ser navê dayika xwe ya 65 salî betal bike lê xizmeta mişteriyan a Turk Telekomê ev yek qebûl nekiriye û gotiye ku divê dayika wî bixwe biaxive. Başaran got ku ew û dayika xwe li ser telefonê bi Turk Telokomê re axivîne. Wî bi tirkî gotiye, dayika wî jî tiştên wî gotine dubare kirine lê vê carê jî kesê pê re axiviye ev yek qebûl nekiriye û jê re gotiye ku dayika wî bi vîna xwe ya azad naaxive, divê dayik bixwe bi tirkî biaxive.

Kampanyaya boykotê

Ev agahî tavilê li ser medyaya civakî belav bû û di nav mijarên sereke yên rojevê de cihê xwe girt. Bi dehhezaran kesan bi hastaga #TurkTelekomBoykot bertek nîşanî vê kiryara Turk Telekomê da û ew şermezar kir. Her wiha gelek kesan ev kiryar bi cihêkarî û nîjadperestiya li dijî kurdan penase kir û li ser hesabên xwe diyar kirin ku ew ê xetên xwe yên Turk Telekomê betal bikin. Li aliyê din gelek kesên nijadperest jî li ser hesabên xwe, bertekên nijadperest nîşanî vê agahiya Omer Başaran dan.

'An bi erebî yan jî bi tirkî'

Piştî bûyer deng veda, Omer Başaran bi Ajansa Mezopotamyayê (MA) re axivî. Başaran da zanîn ku wî ji kesê xizmeta mişteriyan a Turk telekomê re gotiye dayika wî bi tirkî nizane û ji vê pê ve jî dayika wî nikare fêrî tirkî bibe û wiha got; "Ji min re gotin 'zimanê dayikê yê Tirkiyeyê tirkî ye. Em bi tirkî diaxivin û bi tirkî ji hev fêm didin'. Min pirsî got, 'anonsa we ya bi erebî heye çima ya bi kurdî tune ye? Ji min re gotin 'diya te bixwaze dikare bi erebî biaxive' û prosedura wan a kurdî tune ye. Xet negirtin û alikarî jî nedan min."

Di berdewama axaftina xwe de Başaran diyar dike ku piştî dengvedana bûyerê, Turk Telekom telefonê wî kiriye û jê lêborîn xwestiye û wî ji wan re gotiye; "Min ji wan pirsî 'kesên mîna diya min ên bi tirkî nizanin telefonê we bikin hûn ê çi bikin?' Wan ji min re got, 'dibe em di vê mijarê de prosedurek amade bikin.' Bi rastî min ji wan bawer nekir. Heta niha tune bûye, wê ji niha pê de hebe?"

Turk Telekom jî piştî bertekan neçar ma der barê vê bûyerê de daxuyaniyekê bide. Turk Telekom di daxuyaniyê de diyar dike ku îdiayên



tên kirin ne rast in û tu nêzîkatiyeke wan a hemwelatiyên wan biêşîne çênebûye. Di daxuyaniyê de tê gotin ku ew bêyî cihêkariya ol, ziman û nijadî xizmetê didin.

Komeleyên kurdî daxuyanî da

Komeleya Lêkolînên Çand û Ziman a Avestayê, Komeleya Lêkolînên Kurdî, Komeleya Lêkolînê ya Ziman û Çandên Mezopotamyayê, Komeleya Lêkolînên Ziman û Çand û Hunerê yên kar û xebatên çand, huner û zimanê kurdî dikin, bi daxuyaniyeke hevpar nêzîkatiya Turk Telekomê ya cihêkar a li dijî zimanê kurdî şermezar kir. Di daxuyaniyê tê gotin, ev bûyer nîşan dide ku polîtîkayên astengkirin, qedexekirin û kirîmînlîzekirina zimanê kurdî berdewam e û ji ber vê jî ew vê helwesta kiret şermezar dikin. Komele di dawiya daxuyaniya xwe de, ji saziyên bazirganiyê û fermî dixwazin ku xizmeta bi kurdî jî peşkeş bikin û li gorî rastiya pirzimaniya gel tevbigerin.

'Cihêkariya etnîkî ye'

Tora Ziman û Çanda Kurdî jî bertek nîşanî helwesta Turk Telekomê ya li dijî zimanê kurdî da û diyar kir ku rasterast an jî nerasterast sansûrkirina zimanê dayikê yê civakekê, astengiya li ber xizmeta bi zimanê wî gelî cihêkariya etnîkî ye. Torê da zanîn ku Turk Telekomê di daxuyaniya xwe de peyvên kurd-kurdî bi kar neaniye û ev bi serê xwe bûyer piştrast dike.

Bi giştî ji van pêkanînan xuya dibe ku bi awayekî sîstematîk li dijî ziman, çand û hunera kurdî polîtîkaya qedexe, bişaftin û tunekirinê di meriyetê de ye. Her çiqas gelê kurd tevî sazî, partî û dezgehên xwe li hemberî vê polîtîkayê bertekên xwe bi awayên cur bi cur nîşan bide jî hîn ne di wê astê de ne ku dewlet dev ji vê polîtîkayê berde. Loma jî em dikarin bi rehetî bêjin ku wê çarenûsa hebûn û pêşvebirina ziman, çand û hunera kurdî bi xwedîderketin û xebata gelê kurd bê diyarkirin.

BERHEM BI KÎJAN ZIMANÎ BE, DIBE MALÊ WÎ ZIMANÎ

Bihuşta dilê min Amed e

→ Rizoyê Xerzî

Mêvanê me yê vê hejmarê dîsa mamoste û kedkarekî zimanê kurdî ye. De ka em bi hev re ji nêz ve mamoste Amed Tîgrîs nas bikin.

Mamoste em ji Licê dest pê bikin. Tu dikarî behsa bûyer, bîranîn an jî serpêhatiyeke ku ji zaroktiyê tê bîra te û bandoreke mezin li jiyana te kiriye, vebêjî?

Belê, ez li Licê bûme û min li Licê dest bi dibistana seretayî kir. Wê demê li navenda Licê bi tenê dibistanek hebû. Navê wê Gazî Îlkokulu bû. Nêzîkî hezar şagird dihatin dibistanê. Dibistan mezin û gelek qelebalix bû. Licî ji aliyê kurdperwerî û şoreşgeriyê ve xwedî dîrokeke dûr û dirêj in û bajar xwediyê ciyekî stratejîk e. Ez bawer dikim ez di pola sêyem de bûm; rojek ez diçûm dibistanê. Merivekî me ku navê wî Yilmaz Xelîfe bû, rastê min hat û gazî min kir û got, "ka were!" Ez çûm cem, wî destê xwe bir berîka çakêtê xwe ya hundir û rojnameyeke qatkirî girt û kir çenteyê min û ji min re got: "Piştî dibistanê vê rojnameyê bide cîranê xwe Wedoyê Sebrê Zeynikê." Dubare kir ku ez ji derî wî nedim kesek din. Ew li rêya xwe çû sûkê û ez jî çûm dibistanê. Dersê dest pê kir û nîvroyek dersên danê sibê bi dawî bûn. Dema bêhnvedanê bû. Min li polê çenteyê xwe vekir û rojnameyê derxist û lê mêze kir. Haho, di rûpela pêşî de helbesteke kurt bi kurdî hebû. Min bi meraq dest bi xwendina wê kir. Min nekarîbû bixwînim. Jixwe xwendina min a tirkî jî hîn ne baş bû lê min çend car li ser hev kitkit xwend. Piçek bi ser xwendina wê ve bûm. Navê helbestê "Dîcle û Ferat" bû lê navê rojnameyê nayê bîra min. Min hersê rêzên pêşî li ku bû ji ber kir. Helbest kêm zêde weha bû:

"Dîcle Ferat Dîcle Ferat
Hişyar bibin gencên welat
Wa ye îro roja we hat.."

Wekî ez rastî tiştekî pir ecêb bêm. Min hema rojname girt û ez çûm der nav bexçeyê dibistanê. Hevalên me li wir dilîstin. Min gazî wan kir, "ka werin ez ji we re tiştek bixwînim." Hatin û min dest bi xwendina helbestê kir. Zarok li derdora min kom bûn, dest bi ken û qîrînê kirin. Min hew dît li pişt min dengê mamoste hat û bi tirkî got, "hûn çi dikin! Ew çi ye?" Mamoste hat rojname ji destê min girt û ez birim ba mudûr Ahmet Odabaşi. Mudûr rojname girt, lê nêrî ji min re got, "ker kurê kerê ka were vira!" Li min da li min da.. tiliya wî li çavê min ket, stêrk ji ber çavên min çûn, min got qey çavê min rijiya erdê. Min hewar kir. Rondik, çilm û gilêza ku ji devê min hatibûn xwarê ketin nav hev. Bi milê min girt û ez birim odeya mamosteyan. Li wir vê carê bi şermaqan kulê dilê wî rehet nebû ku bi pêhnan jî li min da. Îro jî her cara ku tê bîra min, çavê min çiz dide û tîr dike… Min bîranîn xwe nivîsîne û niha ji bo çapê li ser dixebitim. Min van mijaran bi hûrgilî nivîsîne.

Te gelek salên xwe di nav siyaseta kurdî de jî cih girt. Gelo çi hişt ku pişta xwe bidî siyasetê û berê xwe bidî ziman û wêjeya kurdî?

Hîn di dibistana seretayî de bi min re hezkirina xwendinê çêbûbû lê wê demê li Licê pirtûk tunebûn ku mirov bi dest bixe û bixwîne. Hema çi bi destê min biketana min dixwend. Di cejnan de mamosteyan bi min helbest didan jiberkirin. Me di pola pênçan de cara yekem li Licê piyesek li dar xist û mamosteyê me rola sereke da min. Piştî dibistana seretayî min li Erxeniyê dest bi dibistana mamostetiyê kir. Li dibistana mamostetiyê xaniyek bi serê xwe kutupxane bû. Bi hezaran pirtûk li kutupxaneyê hebûn. Klasîkên cîhaniyên ku wergerandibûn tirkî beşek ji kutupxaneyê dagirtibûn. Dibistana mamostetî, dibistaneke şevînî bû. Piştî dersan di demên vala de ez diçûm kutupxaneyê û min pirtûk dixwendin. Piştî cuntaya Kenan Evren a 1980'yî ez derketim derî welat û li Swêde bûm penaber. Li wir jî ez tim di redaksiyonên kovar û rojnameyan de xebitîm. Piştre min dest bi mamostetiya zimanê dayikê kir û ez li wir jî di komxebatên pirtûkên dersê de xebitîm. Min di kovarên wek Armanc, Berbang, Hêviya Gel, Kurdistan Pressê de wek nivîskar û wek redaktor kar kir. Piştre di radyoyên lokalî û TV'ên kurdî de bernameyên hînbûn û perwerdeyê amade û peşkeş kirin. Yanî dema ez di nav rêxistinan de dixebitîm jî karê min her xwendin û nivîsandin bû.

Ez ne şaş bim te pirtûka xwe ya pêşî di sala 1986'an bi navê "Em Bixwînin" û ya din jî "Em Binivîsin." nivîsandine. Tu dikarî ji kerema xwe re behsa rewş û atmosfera wê demê bikî?

Dema min li paytexta Swêdê Stockholmê dest bi mamostetiya kurdî kir sal 1984 bû. Berî min çend kurdan li wir mamostetî dikir. Min ji wan pirsî kîjan pirtûk û materyalên dersê bi kar tînin. Tu tişt li ber destê wan tune bû. Ji zarokên 7-8 salî re helbestên seydayê Cegerxwîn dixwendin. Di sala 1985'an de Dezgeha Karûbarên Materyalên Dibistanan li Stockholmê xwest bi nivîskar û mamosteyên kurdî re li ser materyalan perwerdeya kurdî civînek çêbikin. Em bi qasî 30-40 kesî civiyan. Mudûra dezgehê got, "pêwîstî bi materyalên perwerdeya kurdî heye. Me ji suryanî û amerîkiyên latînî re çend materyal amade kirin. Em dixwazin niha jî materyalên kurdî çap bikin. Di nav xwe de komeke xebatê hilbijêrin û komê bispêrin me. Em projeya xwe ji wan re pêşkêş dikin." Di civînê de em çar kes ji bo koma xebata materyalên kurdî hatin hilbijartin. Me ji ciyê karê xwe sê meh destûr girt û li xaniyê dezgeha materyalan dest bi xebata pirtûka "Em Bixwînin" kir. Piştre jî weke pirtûka xebatê ya bi navê "Em Binivîsin" me karê xwe domand. Ev xebateke kolektîv bû. Li ser wan herdu pirtûkan navê min ne Amed Tîgrîs e, Jîr Rexnegir e. Piştre koma me çend pirtûkên din jî ji bo dersê amade kirin.

Tu gelek salan li penaberiyê mayî, tu dikarî behsa wê pêvajoyê bikî û çima piştre vegeriyayî welat?

Li biyanistanê dil û çavên min tim li Amedê bûn. Ji ber ku ji derî dibistana seretayî jiyana min li navenda Amedê li Deriyê Mêrdînê derbas bûbû. Me di sala 1965'an de mala xwe ji Licê bar kiribû Deriyê Mêrdînê taxa Husref Paşa ku dewletê di Şerê Sûrê de bi tank û topan xerab kir. Ez 30 sal li derê welêt mam û di sala 2005'an de cara yekem bi paş ve hatim Amedê. Dema ez vegeriyam, Amed ji aliyê bajarvanî, aborî, nifşî, civakî, çandî û siyasî ve ji binî ve hatibû guhertin. Her tişt ji min re xerîb bû. An jî ez ji her tiştî re xerîb bûm. Pêşî di salê de ez çend car dihatim Amedê û diçûm Stockholmê. Ez di destpêkê de nikaribûm li Amedê bi civakê re biguncim. Ez di nav du çandên duca de mam. Ez hem ji dêrê û hem jî ji mizgeftê bûbûm. Min di vê mijarê de bi navê "Li vir û li wir" kurtenivîsek nivîsand. Di wê nivîsa xwe de, civaka kurd û ya swêdî muqayese kir. Piştî derbasbûna çend salên dudilî û dilxişûşiya min û civaka amediyan bi hev kirin û ez li Amedê bi cî bûm. Swêd her çi qas xweş be û civaka wê pêşketî û demokrat be jî, ji bo min biyanistan e. Bihuşta dil û mejiyê min Amed e.

Te zêdeyî 9-10 pirtûkan jî wergerandine kurdî, gelo li gorî te çi sûd ji wergera zimanên din ji bo kurdî heye?

Rola wergerê ji bo pêşketin û dewlemendiya her zimanî mezin û girîng e. Dewletên pêşketî her sal ji bo wergerê butçeyeke mezin terxan dikin. Ji bo ku kurdî bi salan e qedexe ye û nehiştine bibe zimanê nivîs û perwerdeyê, rola wergera pirtûkên biyanî ji bo kurdî bêtir girîntir dibe. Bi wergerê derî û pencereyên ziman, wêje û çandeke din ji kurdî re vedibe. Mirov bi rêya wergerê ziman, wêje û çanda gelên din nas dike. Dibe xwedî zanebûn û agahdariyên dewlemend û rengîn. Di wergerê de du ziman bi hevdu re tên muqayesekirin. Wergêr neçar dimîne ku li du peyv, têgeh, biwêj, gotinên pêşiyan bigere û li hember zimanê biyanî bibîne û binivîse. Ev kar û xebat peyvên ferhenga kurdî dewlementir dike. Di heman demê de hizir û xebata hişmendiyê xurtir û kûrtir dike. Ast û pileya zimanê kurdî bilintir dike. Di vê mijarê de nimûneya herî berbiçav Celadet Bedirxan û Roger Lescot in ku li gorî gramera fransî, gramera kurdî amade kirine. Bi gramera fransî re ast û pileya gramera kurdî jî gelek tekûz û bilindtir bûye. Loma heta niha bi dehan gramerên kurdî hatine nivîsîn lê negehiştîne asta gramera van herdu zanyaran. Niha her gramernivîs ji vir û ji wirê gramera wan diçirpîn, diqusîne, didizîne lê dîsa jî tu kesî heta niha ji wan tiştekî nû peyda nekiriye.

Ji bo kurdên ku bi zimanê din dinivîsin, tu çi dibêjî; gelo dê ew berhemên wan bibin malê kurdan, an jî ew berhem çi sûdê didin kurdan?

Berhem bi kîjan zimanî be, dibe malê wî zimanî. Ev rastiyeke teqez e. Kî vê yekê înkar bike hem xwe ji Xwedê û hem jî ji gelê kurd dike. Ka bila herin li kutupxaneyên Swêdê binêrin, di her kutupxaneyê de beşên zimanê biyanî hene. Wek beşa almanî, fransî, farisî, kurdî, tirkî, erebî û hwd. Kurdên bi kurdî nivîsandine berhemên wan li beşa kurdî hatine bicîkirin û kurdên bi tirkî nivîsandine berhemên wan jî li beşa tirkî hatine bicîkirin.

Gelek ziman ji ser rûyê erdê winda dibin, metirsiyeke wiha ji bo kurdî jî heye? Divê kurd çi bikin ku zimanê xwe ji windabûnê biparêzin?

Bi dîtina min êdî kurdî winda nabe, namire û nakeve nav goristana zimanmiriyan. Kurdî êdî di nav cîhana zimanên nûjen de binyat û razên xwe bi kûrahî berdaye bin axa Kurdistanê. Ciyê xwe baş girtiye. Her çi qas kurdî li Bakur û Rojhilat qedexebe jî, li Başûr û Rojava bûye malê gel. Bi dehan roman, çîrok, serpêhatî, lêkolîn, gotar, rojname, radyo, TV bi kurdî hene. Kurdî rojane li dem û dezgehan tê bikaranîn. Niha zimanekî jîndar û rojane ye. Xwediyê dem û dezgehan e. Ji dibistana seretayî heta zanîngehê bi kurdî perwerde heye. Ferheng, ansîklopedî, gramer, rastnivîsên kurdî bêhejmar in lê ev hemû dîsa têr nakin. Ji bo ku em li ser axa xwe neteweyeke qedîm in nifûsa me nêzîkî 50 milyonî ye. Pêwîst e ziman û çanda me jî li gorî van mercan bin.

Kurd divê du armanc û pêngavên mezin û girîng bidin pêş xwe: Yek, li mal, kolan, kargeh, bazar û mezatan bi kurdî bipeyivîn. Jiyan bi giştî bi kurdî be. Rojname û pirtûkên kurdî bikirin û bixwînin. Di şûna TV'ên dagirkeran de, li weşanên kurdî temaşe û guhdar bikin. TV'ên kurdî jî giraniyê bidin ser bernameyên hewcedar û bi qelîte ku ji aliyê her sinif û tebeqeyên gel ve werin guhdarî û temaşekirin. Armanc û pêngava duyem jî li gel van hemû hewl û xebatan pêwîst e ku hemû partî, rêxistin û kesayetên kurd di mijara ziman, çand û perwerdeya kurdî de xwedî yek şêl, helwest û bername bin. Hemû bi hev re hewldar û dildar bin û zixt bidin ser dewletê ku ew di dibistanên xwe de bi awayekî fermî dest bi perwerdeya kurdî bikin. Rizgarbûna zimanê kurdî bi perwerdeya sîstema dibistanan ve girêdayî ye. Perwerde bi awayekî fermî di dibistanan de tune, di demeke dûr û dirêj de zimanê serdest zora zimanê axaftinê dibe û dikuje. Wê demê polîtîka asîmilasyona dewletê bi ser dikeve.

Bi wergerê derî û pencereyên ziman, wêje û çandeke din ji kurdî re vedibe. Mirov bi rêya wergerê ziman, wêje û çanda gelên din nas dike. Dibe xwedî zanebûn û agahdariyên dewlemend û rengîn. Di wergerê de du ziman bi hevdu re tên muqayesekirin

Amed Tîgrîs kî ye?



Li Licêya Amedê hatiye dinê. Li Licê dibistana seretayî û li Erxaniyê jî dibistana mamostetiyê xwendiye. Di sala 1980'yî de derketiye derveyî welêt û li Stockholmê bi cih bûye. Di warê çand û wêjeyê de xebatên neteweyî kirine. Demekê serokatiya Enstîtûya Kurdî ya Stockholmê kiriye. Ji derî mamostetî û nivîsîna pirtûkên dersan, xebatên wî yên li ser ziman, wêje û çandê jî hene. Ji zimanê tirkî û swêdî çend berhem wergerandine kurdî.

Bişaftina berîya Y'yê

Helîm Barîn

Li bakurê welêt, bişaftin hatiye qeysa xetereyê. Hîn jî êrîşên bişaftinê bi awayekî xurt didomin. Heger li vî parçeyê welêt, di demeke nêz da zimanê perwerdeyê nebe kurdî, ew ê êdî pirr dereng be. Her çiqas hewldanên şexsî bi qîmet bin jî, mirov ji bîr neke ku bişaftin bi pergala bişaftinê pêk tê. Ger li hemberî wê, pergaleka parastina ziman û çandê tune be, ne mumkin e ku mirov ji vê qirkirinê xwe xelas bike. Van salên dawiyê mirov bi zêdebûna civîn û komxebatên li ser zimên keyfxweş bibe jî, ji alîyê din ve bi milyonan zarokên kurd li dibistanên dewletê tên bişaftin. Erê her sal diqewime, bûye tiştek normal, lê sosret e. Her cara bê bîra me ku bi milyonan zarokên kurd li dibistanên dewletê tên bişaftin, divê xof bikeve dilê me, hizûr nemîne ji me ra, divê wek gavek berê me nûçeyeka pirr xerap bihîstibe, em hîs bikin. Divê ti car ev tişt nebe normal ji me ra. Pirr zelal û eşkere ye ku ziman encax bi perwerdehîya zimanê zikmakî dikare xwe ji nav lepên bişaftinê xelas bike. Ji bo vê jî, bi qasî ku xebatên li ser zimên çêdibin, divê ewqas jî xebatên sîyasî û rêxistinî çêbibin da ku li hemberî pergala mêtingerîyê, pergala civakî û çandî ava bibe. Yan na, bi gotina "bi kurdî bipeyve" ev tişt safî nabe! A rast min hê kurdek bişaftî nediye ku bi gotina "bi kurdî bipeyve" li zimanê xwe vegeriyabe. Kurd heya ji dilê wan neyê bi ya yeka/î din nakin. Tu bibêjî "bi kurdî bipeyve", bi ya te nake. Li ber xwe dide. Ka ji ciwanek kurd ra bibêjin: "bi tirkî bipeyve", teqez ew ê bi kurdî bipeyve! Pesindayîn jî carna tiştan tevlihev dike. Li ser meselê, ji bo mirovek bi zimanê xwe bipeyve, hewce nake zimanê wê/î li cîhanê zimanê herî dewlemend be. Nizanim kurdî di rêza çendan da be jî. Li cîhanê kesek ji ber ku zimanê wê/î dewlemend e bi zimanê xwe napeyve. Kurdî zimanekî feqîr be jî, divê bi zimanê xwe bipeyvim. Carna tiştên sade bêtir derbê lê dixin. Mirov bi zimanê xwe dipeyve û hew. Li şûna mirovî kurd, li şûna zimên jî kurdî deyne, çû xelas. A grîng pergal e. Heya ku kurdî bi pergala jiyanê ra li hev neke, ew ê xwe ji vê xetereyê nikaribe xelas bike. Cerebeyên dinyayê hene li ser vê mijarê. Li ser meseleyê, Katalanan ji bo vê pergalê bi pêş bixin ezmûna katalanî çêkirine û kesên ku ji vê ezmûnê derbas nebin ne mimkûn e çi li hikûmeta Katalan û çi jî li şaredarîya Barselonayê bixebitin. Pergala ku ava dikin wan ber bi zimanê wan ve dibe. Em hîn di qonaxa şîret û peşniyaran de ne. Şîret an jî pêşniyar keyfî ne. Tu dikî nakî bi te maye lê pergal, jiyanî ye. Heya pergala çand û zimanê kurdî ava nebe jî, bê ziman jiyan dibe! Jiyanek bişaftî, bê kok, bê esl lê dibe. Wa hûn dibînin. Lê di nav pergala mêtingehî ya tirk-î de hûn çiqas li ber xwe bidin jî pergal we ber bi tirkî ve dibe. Ji ber wê jî, bê tirkî jiyan nabe. Divê pêşîyê bi vê rastiya tund ra em serê xwe biêşînin.

Ez dixwazim di vê çarçoveyê da matmayîna xwe bi we ra parve bikim. Pêşî bibêjim li ser rêzimên napeyvim û ne hedê min e lê ligel xetereyên ku min gavek berê got jî hezar mixabin ku kurdî xwe ji dorpêçkirina rêzimana kurdî xelas nake û cewhera meselê nayê nîqaşkirin. Bi qasî ku î'ya berîya y'yê tê nîqaşkirin, ewqasî bişaftin û qirkirina çandî nayê nîqaşkirin. Bila şaş neyê famkirin, helbet zagon û rêzikên zimanan girîng in, divê bên lêkolîn, nîqaşkirin lê rêzimana zimanekî ji bişaftina zimanekî bêtir bê nîqaşkirin divê em li wir rawestin. Bifikirin. Li Bakur li gorî firotina pirtukên kurdî em jê fam dikin ku nîqaşên rêziman û rastnivîsê herî pirr bi 5 hezar mirovî ra eleqedar e û dîsa em fam dikin ku bi 5 hezar kesî ra qet nebe hişmendiya zimên çêbûye ku rêzimana zimanên xwe fêr bûne. Ev heya cîyekî hêvîyê xurt dike lê bi min ev 5 hezar kes bila bela xwe ji hev vekin û berê xwe bidin van zarokên li dibistanên tirkan tên bişaftin. Bila rewşa van zarokan ji Î'ya beriya Y'yê bêtir bê nîqaşkirin. Yan na li Bakur ew ê kurdîyek ku em li ser bipeyvin nemîne. Dîsa dema tiştên baş jî diqewimin, -bi qasî dibînim- nayên pîrozkirin û nayên nîqaşkirin. Mînak hene, bi milyonan pirtûkên kurdî li Rojavayê bo perwerdeyê hat çapkirin, dîsa di nav xemxwirên kurdî da bi qasî Î'ya beriya Y'yê nehat nîqaşkirin. Ma Muzîk di dema koronayê da bi rêya vîdyoyan dersên muzîkê bi kurdî dan. Ev hewldana wan dîsa bi qasî Î'ya berîya Y'yê nebû rojev. Dirêj nekim. Bi kurt û kurmancî beriya Y'yê divê tekoşîna li dijî pergala qirkirina çandî û bişaftinê were, yan na ew ê Y'yek ku em ê li ser bipeyvin nemîne..



Firat Cewerî

Çima dinivîsim?

Gotina "çima tu dinîvîsî?" her çiqas pir hêsan bixuye jî, yek ji pirsên herî zehmet e. Çima ez dinivîsim? Çima min nivîsand? Çima min bi kurdî nivîsand? Ma mamosteyê min ez teşwîq kirim? Na! Ma rîsipiyên malbatê halan di min hildan, gotin Firatê min, binivîse? Na! Ma rêxistina min, partiya min, eşîra min got, binivîse? Na! Ma min bi kurdî binivîsanda ez ê navdar bibûma? Na! Ma ez ê bi nivîsandina kurdî dewlemend bibûma û pê bibûma xwediyê mal û milk? Dîsa na.

Gava min nivîsand, ev hemû gotinên ku min li dû hev rêz kirin li dijberî min radiwestiyan. Bi nivîsandinê girtin, koçberî, heta kuştin li benda min bûn. Ji ber ku ên berî min di wê riyê re bihurîbûn. Ên ku berî min bi kurdî nivîsandibûn di nav xelatan de nemabûn. Wan ji ber nivîsandinê tenê êş û elem kişandibûn.

Ya rastî gava min nivîsand, haya min zêde ji wan jî tunebû. Tenê mîna ku dengek diket guhên min û digot binivîse! Min jî nivîsand. Ev nêzîkî çil salî ye ez di vê riyê re dimeşim. Carina riya min teng, carina fireh dibe. Ez carina mîna bi serkaşekî ve hilkişim, diwestim, lê ranawestim û bi jor ve radipelikim. Ez carina diêşim, carina ên ku ez bi zarê wan dinivîsim min diêşînin, lê wê êşê jî dinivîsim. Gava nanivîsim aciz dibim, gava nikarim binivîsim dinya li ber çavên min reş dibe. Nivîsandin her tim ji min re bûye gopalê hêviyê û min xwe daye ser. Her cara ez bêhêvî bûme nivîsandin hatiye hawara min. Gotina "Berê gotin hebû" di dil û mêjiyê min de rûniştiye û loma min hertim xwe spartiye gotinê. Min hêrsa xwe, evîna xwe, bêrîkirina xwe, bêhntengiya xwe bi gotina nivîskî daye der. Nivîsê carina cîhana fireh li min teng kiriye, carina jî cîhana teng li min pir fireh kiriye. Cîhanek kiriye du, sê, çar cîhan. Bi xêra nivîsê min gelek caran xwe ji vê cîhana heyî daye alî û li cîhanine din geriyame. Ez ji rastiya heyî bi dûr ketime û min li gora xwe rastîne din ava kirine. Ez di cîhana xeyalan de li dû xeyal û fantaziyan beziyame. Ez carina bi dû nêçîra mirovên belengaz ketime, min bi destê wan girtiye, ew ji quncikên wan ên xalî derxistine û xwestiye balê bikişînim ser wan. Ez carina pêrgî hin gernasan hatime ku ji wan re xerab ketiye û di quncikên xwe de hatine jibîrkirin. Heta ji min hatiye min ew jî derxistine rûkala dinyayê. Ez carina keniyame, carina jî ewrekî xemgîniyê bi ser min de girtiye û bi qûre qûr giriyame. Ez carina bi rojan li dû gotinekê geriyame, carina jî mîna ku yek di guhên min de bike pistînî, gotin li dû hev rêz bûne. Min carina jiyanek, carina bajarek, carina cîhaneke din ava kiriye. Carina jî min jiyanek, bajarek, cîhanek bi du rêzan ji navê rakiriye. Ez hingî bi hêza gotinê hesiyame. Gava min ew hêz di xwe de dîtiye ez ji xwe tirsiyame. Lê ez ji tu hêzeke din netirsiyame. Min cesareta xwe ji nivîsê standiye. Min bi nivîsa xwe tu carî nexwestiye ez kesî pîs bikim an biêşînim. Min pê pesnê pîsan jî nedaye. Ez bi aqilê xwe şêwirîme û min daye dû dilê xwe.

Nivîsandin wek vîrusekê ye, di hemû laşê min de geriyaye, ez bixwazim jî nikarim jê pak bibim. Min di jiyana xwe de nexweşî mîna nexweşiya nivîskariyê nedîtiye. Gava tê, mirov nema jê pak dibe, heta mirinê dev ji mirov bernade. Loma, nivîsandin nexweşiyeke şexsî ye. Gava mirovê nivîskar nenivîse, diêşe, bi nivîsê êşa xwe sivik dike. Ez ê nebêjim ji bo ez êşa mirovatiyê kêm bikim ez dinivîsim û ez ê nebêjim armanca nivîsandina min ji zilmê rizgarkirina xelkên dinyayê ne jî. Ez dikarim tenê vê bibêjim, dibe ku bi nivîsandinê ez êşa xwe kêm dikim. Ez yek im, gelek kesên din jî dikarin xwe di min de bibînin. Bi nivîsandinê, ez gelek jiyanan di jiyanekê de dicivînim. Gelek kesan di kesekî de. Ez dibêjim, mirovek nikare xwe di jiyana hezar kesî de bibîne, lê hezar kes dikarin xwe di jiyana yekî de bibînin. Loma, divê ew yekê ku ji destê nivîskar hatiye afirandin dereweke ji rastiyê rastir be ku xwe dirêjî dil û mêjiyê bi hezaran bike.

Her çiqas hezar jî xwe tê de bibînin, divê ez bi durustî bibêjim ku di gava pêşî de ez ji bo xwe, ji bo liva di hundirê xwe de, ji bo dermankirina birînên dil û ruhê xwe dinivîsim. Ev helwest carina dikare bi kêrî dermankirina birînên dil û ruhên ên din jî bê.

Dîsa jî armanca nivîsê ne bi tenê dermankirina êş û janan e. Mirovan bi hezar salan, bi hezar armancan nivîsandine. Ya min jî bi tenê nixteyek ji wan e, dilopek ji deryaya bêbinî ya gotinê ye…

Kovîd-19 li Kurdistanê zêde dibe

Navenda Nûçeyan

Hejmara kesên bi nexweşiya Kovîd-19'ê li cîhanê li derdora 24 milyonî ye. Li herêma me jî pergala tenduristiyê dixitime, cih li nexweşxaneyan namîne û nexweşî bi lez belav dibe

Li gorî malpera "Worldometer"ê li seranserê cîhanê hejmara kesên bi nexweşiya Kovîd-19'ê ketine bûye zêdeyî 24 milyon. Her wiha zêdeyî 800 hezar kesan jiyana xwe ji dest daye. Hejmara kesên ji vê nexweşiyê pak jî bûne gihaye derdora 13 milyonî.

Nexweşiya bi Kovîd-19'ê hîn jî bi dijwarî li gelek deverên cîhanê belav dibe. Di vê dema dawî de bandora vê nexweşiyê li hemû Kurditanê û bi taybetî li Bakur gelekî zêde bûye. Her wiha li rojavayê Kurdistanê ku ji destpêka belavbûna vê nexweşiyê de, hin tedbîrên baş girtin. Bi van dedbîran dikaribûn heta demekê xwe ji vê nexweşiyê biparêzin lê di vê meha dawî de ev nexweşî bi rengekî berbiçav li vê derê jî belav dibe.

Bîlançoya Rojava

Desteya Tenduristiyê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ragihand ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nexweşekî din ê bi vîrûsa koronayê mir.

Hevserokê Desteya Tenduristiyê Ciwan Mistefa diyar kir ku kesê bi vîrûsê ketibû miriye. Temenê wî 58 e û ji Dêrika herêma Cizîrê ye.

Mistefa da zanîn ku 31 kesên din bi vîrusa koronayê ketin (20 mêr û 11 jin) ji van herêman in;

-Hesekê 7, Qamişlo 14, Rimêlan; 2, Girkê Legê; 1, Dêrikê; 3, Tirbespiyê; 3, Dêrazorê; 1.

Hejmara giştî ya nexweşên vîrûsa koronayê li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 425 e. Ji vana heta niha 27 kesan canê xwe ji dest daye û 75 kes jî baş bûne.

Bîlançoya Tirkiyeyê

Wezîrê Tenduristiyê Fahrettîn Koca, daneyên der barê vîrûsa koronayê yên dawî de parve kirin. Li gor daneyên ku Koca parve kirine heta dema amadekirina vê nûçeyê li Tirkiyeyê di rojekê de 24 kesên din jî jiyana xwe ji dest dane û hezar û 502 kesên din jî bi şewbê ketine. Bi van daneyên dawî re hejmara kesên heya niha bi şewbê ketine bû 261 hezar û 194 û hejmara kesên heya niha jiyana xwe ji dest dane jî bû zêdeyî 6 hezaran.

Li Başûr jî nexweşî zêde bûye

Wezareta Tenduristiyê ya Herêma Kurdistanê daneyên nû yên der barê nexweşiya Kovîd-19'ê de aşkera kir. Li gorî zanyariyên hatine aşkerakirin li Herêma Kurdistanê di rojekê de nexweşî li 677 kesên din peyda bûye û 18 kes jî mirine. Her wiha 312 nexweş baş bûne û test ji bo 4 hezar û 928 kesan hatiye kirin.

Li Herêma Kurdistanê li gorî daneyan heta niha 25 hezar û 929 kes nexweş ketine; 948 kes bi Kovîd-19'ê mirine; hejmara nexweşên baş bûne 15 hezar û 494 e.

Di dema dawî de li gelek bajarên bakurê Kurdistanê jî hejmara nexweşan zêde dibe û yek ji bajarên ku herî zêde ev nexweşî lê belav bûye Êlih ye.

Li Êlihê nexweşî zêde bû

Li nexweşxaneyên Êlihê ji ber pêketiyên koronayê cih nema. Tê gotin rojane testa 350 kesî pozîtîf derdikeve. Pêketiyên koronayê yên dixwazin biçin nexweşxaneyan jî ambûlans wan nabin. Ev dibe cihê nîqaşê. Hevserokê SES'ê Denîz Topkan got, hefteya borî 7 kesên di dora lênêrîna awarte de bûn mirin.

Ji ber zêdebûna pêketiyên koronayê pergala tenduristiyê li Êlihê teviziye. Ji ber tedbîr nayên girtin li Êlihê her roja pêketiyên nû zêde dibin. Li Êlihê test pir hindik tên kirin. Piştî bertek nîşanî hindikbûna testan hat dayîn, niha rojane hejmara testan derxistine 700'î. Nîvê testan pozîtîf derdikevin. Heta niha li Êlihê testa 15 hezar kesan pozîtîf derketiye û 40 kes di bin çavdêriya komên fîlyasyonê de ne.

Ji ber zêdebûna pêketiyên koronayê li Nexweşxaneya Herêmê ya Dewletê ya Êlihê ku wek nexweşxaneya pandemiyê xizmetê dide, cih nemaye. Welatiyên bi koronayê dikevin jî nikarin xwe bigihînin xizmeta tenduristiyê û welatî bi zehmetiyan re rûbirû dimînin.

Nîvê testan pozîtîv derdikevin

Hevserokê Sendîkaya Kedkarên Xizmeta Tenduristiyê û Civakî (SES) a Êlihê Denîz Topkan diyar kir ku li Êlihê testên ku rojane tên kirin nîvê wan pozîtîf derdikevin. Topkan da zanîn ku rayedarên saziyên fermî helwesta "em dizanin" nîşan didin û heta niha midûriyeta tenduristiyê û walîtî li xwe mikûr nehatiye û ev jî cidîbûna rewşê nîşan dide. Topkan destnîşan kir ku komên fîlasyonê li Êlihê çavdêrî li 40 hezar kesî dikin. Li bajêr 3 hezar û 500 xebatkarên tenduristiyê hene, testên 700 kesan pozîtîf derketine. Topkan da zanîn ku hejmara pêketiyan her roja zêde dibe, pergala tenduristiyê têrê nake û divê rayedar hîn bêtir derfetên xwe bixin dewrê.

Li Êlihê 7 kes mirin

Topkan destnîşan kir ku hefteya borî li Êlihê 7 kesên bi koronayê ketibûn û di dora lênêrîna awarte de bûn jiyana xwe ji dest dane û ji ber ev yek metirsiyê çêdike, xelk jî ji vê yekê nerazîbûna xwe tîne ziman.

Li Bakur rewşa girtiyan

Di rojên dawî de bi zêdebûna pêketiyên şewba vîrûsa koronayê (Kovîd-19) re, ji nû ve hemû nêrîn veguherîn ser girtîgehan. Ji destpêka pêvajoya şewba vîrûsa koronayê de, li girtîgehan di bin navê bergiriyan de mafê hevdîtina vekirî û girtî, qadên hevpar ên spor, atolye û pirtûkxaneyê hatin qedexekirin û ji bo qawîşan amûrên paqijiyê yên pêwîst an qet nayê dayîn, an jî pir kêm tên dayîn. Endama Lijneya Rêveberiya CÎSST'ê Berîvan Korkût, têkildarî mijarê axivî û diyar kir ku ew nizanin çiqas girtî bi şewbê ketine û der barê vê yekê de agahiyeke zelal tune ye. Korkût, da zanîn ku ji destpêka pêvajoya şewba vîrûsa koronayê de, li girtîgehan mafê tenduristiyê ji holê hatiye rakirin û got: "Ev rewş ji bo girtiyan dibe sedama pirsgirêkên cidî." Her wiha da xuyakirin ku Serokatiya Malên Ragirtin û Cezayê (CTE) di 25'ê hezîranê de daxuyaniyek da û wiha got: "CTE di vê daxuyaniya xwe de gotibû 91 girtî bi şewbê ketine lê min ji vê hejmarê bawer nekir. Divê wezareta dadê, dem bi dem der barê rewşa girtiyan de daxuyanî bide. Divê der barê şert û mercên girtîgehan û rewşa girtiyan de, bi awayekî bi rêk û pêk daxuyanî bên dayîn.

Hejmara nexweşan herî zêde li DYA'yê ye

Li cîhanê welatê ku mirin û pêketiyên wê herî zêde ne, DYA ye. Li DYA'yê hejmara pêketiyan derketiye 5 milyon û 956 hezar û 36'an. 182 hezar û 412 kes jî mirine. Piştî DYA'yê welatên ku hejmara pêketiyan ji 250 hezarî zêdetir e wiha ye: "Brezîlya (3 milyon û 674 hezar û 176), Hindistan (3 milyon û 235 hezar û 735), Rûsya (970 hezar û 865), Afrîkaya Başûr (613 hezar û 17), Perû (607 hezar û 382), Meksîka (568 hezar û 621), Kolombiya (562 hezar û 128), Îspanya (423 hezar û 224), Şîlî (400 hezar û 985), Îran (363 hezar û 363), Arjantîn (359 hezar û 638), Îngilistan (327 hezar û 798), Erebistana Siûdî (309 hezar û 768), Bangladeş (299 hezar û 628), Pakistan (294 hezar û 193), Tirkiye (261 hezar û 194) û Îtalya (261 hezar û 174)."

Rojeva lûtkeya Urdun, Iraq û Misrê

Li paytexta Urdun Umanê di navbera Şahê Urdunê Abdullah Sanî, serokê Misirê Ebdulfetah Sîsî û serokwezîrê Iraqê Mistefa Kazimî de lûtkeyeke sêalî li dar ket.

Di lutkeyê de her sê alî, mijarên hevkarî, istîsmar û aboriya di navbera welatên xwe de, dozên herêmî û di serî de doza Filîstînê, têkoşîna li dijî terorê û dozên Sûriye û Lîbyayê, gotûbêj kirin.

Abdullah Sanî û Sîsî têkiliyên her du welatan û pêşketinên dawî yên li herêmê û di serî de doza Filîstînê, her wiha hevkarî û koordîneya ji bo pêşîgirtina belavbûna vîrûsa koronayê û sivikirina bandora wê ya mirovî û aborî guftûgo kirin.

Li gorî Ajansa Nûçeyan a Urdunê Betrayê, "Şahê Urdunê îşaret bi girîngiya destekdayîna keda Misirê ya ji bo têkoşîna li dijî terorê, kir."

'Derd hevpar e'

Rojamevanê misirî Mehmûd Beysûnî der barê vê lûtkeyê de axivî û got: "Civîna sêalî ya serokê Misirê Abdulfetah Sîsî, şahê Urdunê Abdullah Sanî û serokwezîrê Iraqê Mistefa Kazimî di çarçoveya tevkariya her sê welatan Misir, Urdun û Iraqê de pêk hatiye."

Beysûnî destnîşan kir, "Lûtke cara duyemîn li dar dikeve, piştî çalakiyên li Qahîreyê sala 2019'an dest pê kir. Ev lûtke di esasê xwe de ji bo xurtkirina tevkariya aborî, bazirganî û razemeniya di navbera her sê welatan de û nîqaşkirina dozên herêmî de pêk hat."

Rojnamevanê misirî diyar kir ku derdê her sê welatan hevpar û giran e û wiha got: "Derdê hersê welatan di aliyê herêmî, erebî û rageşiyên li ser wan hatine ferzkirin hevpar e. Di serî de di aliyê geşkirina aborî, têkoşîna li dijî terorê û destwerdanên herêmî de derdê wan yek e."

Beysûnî wiha got, "Lûtke di nav xwe de nameya piştgiriya Iraqê li dijî xeteriyên milîsan û kotaya mezhebî ya li Iraqê ye dide. Her wiha nameyên piştgiriya Iraqê li dijî zêdegaviyên Tirkiyê yên li ser xaka Iraqê dide. Dîsa jî Urdun koma Îxwan a terorîst ji hev xist, ji ber wê rageşeyên ewlehî û siyasî xwe ferz kirine. Misir destekê dide Iraq û Urdunê li hemberî koma Îxwan a terorîst û xeteriya milîsên çekdar."

Rojnamevanê misirê Mehmûd Beysûnî destnîşan kir ku rûxandina têgîna dewleta niştimanî ya cîhana erebî, wek rageşiya sereke di lûtkeya sêalî de hatiye nîşandan û wiha got: "Lûtke ji bo xebatên Misirê yên ji nûve avakirina hevsengiyê di qada erebî de xurt bike, her wiha têgihîna dewleta niştimanî û berxwedana li dijî hewldanên hegemoniya herêmî xurt dike ya hin dewletên mîna Tirkiye û Qeterê bi desteka rêxistinên tundrew û milîsên leşkerî hewl didin pêk bînin." *UMAN*

Mijara sereke yekitiya neteweyî ye

Pêwîstiya yekitiya kurdan, armanca ferzkirina koçberiyê ya li herêmê û projeya neteweya demokratîk mijarên sereke yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ne

Nîqaşên der barê avakirina yekitiya kurdan a li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de bi gelek awayan didomin. Partî, sazî û dezgehên kurdan demeke dirêj e ji bo yekitiyê dixebitin.

Endama Desteya Rêveber û Hevseroka Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) a herêma Firatê Bêrîvan Hesen û nivîskar û mamosteyê wêjeya kurdî ya li Zanîngeha Rojava Beşîr Mele Newaf bal kişandin ser mijara avakirina yekitiya kurdî.

Armanc berjewendî ne

Endama Desteya Rêveber û Hevseroka PYD'a herêma Firatê Bêrîvan Hesen diyar kir ku pêvajoya ku Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê tê re derbas dibe, bandoreke neyînî li gel dike û got: "Tevî hemû şert û mercan gef û êrîşan, gelê me dest ji Rêveberiya Xweser û HSD'ê berneda. Mînaka vê yekê jî mayîna li ser axa xwe ye. Gelê li herêmên rêjîma Baasê dijî ji ber şer koçî Tirkiyeyê kir. Dewleta tirk jî wan koçberan ji bo berjewendiyên xwe bi kar tîne. Bi taybetî welatiyên Heleb, Bab, Cereblûs û Şamê berê xwe da Tirkiyeyê lê belê welatiyên Serêkanî û Girê Spî berê xwe neda Tirkiyeyê."

'Teng fikirîn hilweşandine'

Hesen da zanîn ku avakirina yekitiya kurdî avakirina Sûriyeya demokratîk e û mijar wiha şîrove kir: "Rêveberiya Xweser di rêziknameya xwe de netewa demokratîk bingeh digire. Rast e gelê kurd ev proje ava kir lê rêveberiyeke wiha ye ku hemû pêkhateyên Sûriyeyê bi ziman, çand, bawerî û rengên cuda hembêz dike. Ji bo vê divê ku partiyên kurdî li ser vê bingehê bifikirin. Beriya me kesên ku teng fikirîne û pergala xwe teng avakirine zû hilweşiyan. Lewra divê ku em berferh bifikirin. Armanca xebatên yekitiya kurdî, avakirina Sûriyeke demokratîk e ku hemû netewe û pêkhateyên li Sûriyeyê bikaribin xwe bi nasnameya xwe ya resen beşdarî pergalê bibin." Hesen di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser sîxuriya di nav gel de tê pêşxistin û got: "Hêviya me ji gel heye ku neyê lîstokan û neyê xapandin. Haya wan ji polîtîkayên hebe."

'Avakirina yekitiyê hewce ye'

Nivîskar û mamosteyê wêjeya kurdî ya li Zanîngeha Rojava Beşîr Mele Newaf jî destnîşan kir ku yekitiya neteweyî ya Kurdistanê ji bo gelê kurd pêwîstiyeke civakî û mirovî ye û divê tevahiya sazî û civakê beşdarî yekitiyê bibin û zextê li kesên ji vê yekitiyê re dibin kelem, bikin. Newaf da zanîn ku çi bi zanebûn û çi bi nezanî be kesên yekitiya neteweyî asteng dikin, xizmeta dijminên gelê kurd dikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji ber vê yekê divê civak vê baş ji hevdu derxîne. Her wiha kesên ji bo yekitiya kurdan kar û xebatê dikin divê gel hişyar bikin û ji wan re zelal bikin ka çi dikeve xizmeta gel û çi nakeve xizmeta gel. Doza kurdan ne doza partî, eşîr an jî aliyekî diyarker e. Doza exlaq û wijdanê ye. Bi hebûna gelê kurd û pêşeroja wan ve girêdayî ye. Lewma yekane rêya serkeftina gelê kurd avakirina yekitiya neteweyî ye. Kesên li ber yekitiyê dibin kelem nabe di nav civakê de bimînin." ***KOBANÊ***

'Ambargoya li ser Mexmûrê dijqanûnî ye'

Ji 17'ê tîrmeha 2019'an ve li hemberî Wargeha Penaberan a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) ambargoyek heye. Li Mexmûrê bi hezar û 200 kesan re nexweşiyên demdirêj hene, ew nikarin biçin nexweşxaneyan. 2 hezar û 500 karker jî bêkar mane. Di dema ambargoyê de çar jinên ducanî ji ber ku nehiştin biçin nexweşxaneyê zarok ji ber wan çûn. Sê zarok û welatiyek bi temen ku pêwîstiya wan bi oksîjenê hebû, ji ber demek dirêj li benda kontrolê ya Hewlêrê hatin rawestandin û destûr nehat dayîn biçin Hewlêrê, canê xwe ji dest dabûn. Ligel nîqaş û hevdîtinan hê jî ambargoya li hemberî wargehê tê domandin.

Ji hêla Diplomasî ya Meclîsa Wargeha Mexmûrê ve şandeyek hat avakirin û ev şande bi partiyên siyasî û saziyên sivîl re der barê rewşa wargehê de rêzehevdîtin kirin. Endama Dîplomasiya Jinan a Kampa Mexmûrê Leyla Arzu Îlhan a di nav şandeya Mexmûrê de cih digre, têkildarî rewşa Mexmûrê de nêrînên xwe anîn ziman.

Arzû, destnîşan kir ku rûniştvanên wargehê bi eslê xwe xelkê herêma Botanê ne û bi taybetî cotkarî û sewalkariyê dikin. Arzû, da zanîn ku ji ber metirsiya DAIŞ'ê û êrîşan nikarin çandînî û sewalkariyê bikin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) li ser navê hikûmeta herêmê ambargo danî ser wargehê lê di dema hevdîtinên me yên li gel aliyan de jî rastiya wê derket ku biryarek ne qanûnî ye. Hemû alî û rêxistinan jî da zanîn ku biryara ambargoyê ne qanûnî ye, biryarek siyasî ye û ne biryara hikûmetê ye. Ev ambargo li dijî hemû pîvanên qanûnî û navneteweyî ne."

Arzû, diyar kir ku her kes dizane ku navçeya Mexmûrê di warê îdarî de di navbera hikûmeta navendî û hikûmeta herêmê de nîvenîv e û got: "Em bi waliyê Hewlêrê û berpirsên asayîşa Hewlêrê re axivîn lê bi awayekî fermî sedema biryara ambargoyê diyar nekirin û dibêjin ferman ya jorê ye lê ne diyar e ferman a kê ye. Me li Silêmaniyê hevdîtin kirin û erênî bûn. Hemû alî dibêjin ambargoya li ser wargehê ne biryara hikûmeta herêmê ye û biryarek siyasî ye."

Arzû, bang li aliyên siyasî û rêxistinan kir û diyar kir ku bi yekhelwestiya rêxistinên başûrê Kurdistanê, li gorî pîvanên navneteweyî û qanûnên Iraqê dikarin vê ambargoyê rakin. ***MEXMÛR***

Li Belerûsyayê nerazîbûn berdewam in

Li Belerûsyayê bi deh hezaran kes dîsa herikîn kolanên paytext Mînskê ku tundiya polîsan a li ser xwepêşanderên li dijî hikûmetê û binçavkirina bi sedan kesan şermezar bikin.

Di dema xwepêşandanê de hejmareke leşkerên ku avahîya navenda hikûmetê diparêzin, wek piştgiriyekê bi xwepêşanderan re mertalên xwe nizim kirin.

Li vî welatî ji beriya heftiyekê de xwepêşandêr derketine qadan ku encamên hilbijartina serokatiyê protesto bikin. Xwepêşandan di ji ber nerazîbûna li dijî encamên hilbijartinê dest pê kiribûn.

Li gorî encamên ku ji alî Komîsyona hilbijartinê ve hatibû diyakirin, Lukashenko, ku 26 sal in li desthilatê ye, ji sedî 80'yê dengan wergirtiye û bi ser ketiye. Li ser aşkerabûna encaman protesto dest pê kiribûn û di pevçûnan de 2 kes hatibûn kuştin û derdora 6 hezar kes jî hatibûn binçavkirin.

Ji bo kêmkirina hêrsa xwepêşanderan desthilatiya vî welatî gelek kesên ku hatibûn binçavkirin serbest berdan lê xwepêşander nerazîbûnên xwe li dijî encaman berdewam in û bi taybetî piştî ku dîmenê Lukashenko yê biçek ê di nav parêzvanên xwe de hatin belavkirin, xuyaye vê yekê hêrsa xwepêşanderan zêdetir kir lewre bi hejmareke zêde gel dîsa daket kolanan. ***MÎNSK***

Xweşkanî

Felemez Ulug

Di gel de hêza berxwedanê heye

Dewleta tirk bi hemû derfet û hêza xwe ve dixwaze îradeya gelê kurd binpê bike. Ji bo vê jî çi ji destê wê tê texsîr nake. Li hemberî van êrîş û zextên dewleta tirk, gelê kurd bi îradeyek mezin li ber xwe dide lê mixabin ev berxwedan û tekoşîna gelê kurd ji nedîtinê ve tê.

Di sedsala 21'mîn de li ber çavê hemû cîhanê dewleta tirk bi awayên hovanê kurdan qetil dike lê mixabin li hemberî van êrîşên tunekirinê di serî de NY, Amerîka, Rûsya û gelek hêzên din ên navneteweyî rola sê meymûnan dilîzin. Ev jî bi awayekî aşkera radixe ber çava ku ew vê polîtîkaya dewleta tirk erê dikin.

Li Kurdistanê êdî rewş pir cuda ye. Hikûmeta Erdogan û Bahçelî ji bo di her qada civakê de îradeya gelê kurd bişkînin û ji tekoşînê dûr bixin çi ji destê wan tê dikin. Ji bo vê jî serî li gelek rê û rêbazên qirêj ên derveyî exlaqê civakê jî didin. Di rojên borî me gelek mînakên vê li ser ekranên televîzyonan dîtin û di rûpelên rojnameyan de xwendin. Her çiqas çend saziyên ragihandinê bi awayekî wêrek van nûçeyan dinivîsin jî ev têr nake ku mirov bikaribe rûyê rast ê vê hikûmeta antî-kurd bibîne. Ev tifaqa ku li ser dijîtiya li kurdan hatiye avakirin jî bi her awayî êrîşî nirxên gelan dike û dixwaze emrê xwe bi vî awayî dirêj bike. Têkoşîna gelan ger xwe li ser hîmekî rast birêxistin bike û hêza xwe ya berxwedanê derxîne holê, wê bikaribe van êrîşan bişikîne û vê siyaseta pûç têk bibe.

Erdogan êdî baş dizane ku mîna berê gel ji wî bawer nake. Bi vê ve girêdayî di qada siyasî de jî her roj hêza xwe ji dest dide. Ji ber ku ew jî dizane kesên li derdora wî kombûne hemû ne ew kesên ku bi dilsozî bi wî ve girêdayî ne. Ev kes hemû li pey berjewendiyên xwe ne. Ger berjewendiyên wan têk biçin û rewşa wan xira bibe wê di serî de Erdogan û hikûmeta wî bifroşin. Lewma Erdogan ji bo xwe ewlehiya xwe misoger bi yasayên cuda ve hin kes li derdora xwe kom kirine û ev kes bi çek kirine. Gelo ev dê ji bo xelasiya Erdogan bes be?

Ev çeteyên Erdogan û Bahçelî li derdora xwe kom kirine bi feraseta neo-Osmanî tên perwedekirin û rêxistinkirin. Lewma ev çeteyên ku bi vî exlaqî tên berhevkirin dûrî nirxên civakî dimînin. Ji ber vê yekê ji bo xwe her tiştî heq dibînin. Bi taybetî di van çend mehên dawî de destdirêjî û xirabiyên ku li Kurdistanê hatin jiyîn em mêze dikin bi destê van çetayan hatine kirin. Ev jî radixe ber çavan ku dewleta faşîst a tirk ne tenê di warê leşkerî û polîtîk de êrîşî kurdan dike di her qada civakê de dixwaze îradeya gel bişikîne û wî ji têkoşînê sar bike û dûr bixe.

Dewleta tirk di salên 90'î de bi destê kontra, leşker û polîsan ve gelek êşên mezin bi gelê herêmê dan jiyîn. Di roja me ya îroyîn de di zîhniyeta dewleta tirk de tu guhertin çênebûye. Niha jî bi heman siyasetê li himberî kurdan e lê ji bo di vî emelê xwe yê xirab de hîn bi bandor bibe leşker û cerdevanên xwe bi awayekî pispor perwede kirine. Ev kesên ku ji herêmên Tirkiyeyê yên cuda kom kirine, ew kes in ku bi tu awayî fêdeya wan ji civakê re nebûye û dûrî nirxên civakê ne. Lewma ev kes bi çavsoriyeke mezin li Kurdistanê êrîşî nirxên civakî dikin. Ji bo vê hatine perwedekirin.

Tifaqa Erdogan û Bahçelî di xirabî û tecawizkirina nirxên civakî de li gor zîhniyeta ku ew temsîl dikin tevgeriyan. Xirabî û talan di çanda wan de heye. Lewma bi van pêkanînên bi destê leşker û çeteyan li ser civakê tên ferzkirin, serfiraz in. Ev pêkanînên li derveyî exlaq û çanda civakê ji xwe re kirine riya xilasiyê lê civaka ku bi tu awayî ji çand û hebûna xwe tavîz nedaye wê bi tekoşîneke hêja û xurt li ber xwe bide. Ev berxwedan, berxwedana xwedîderketina li nirx û hebûna xwe ye. Pêwîst e gelê herêmê ji bo vê berxwerdanê hêza rêxistin û tekoşînê ava bike. Wê demê serkeftin nêz e. Riya xilasî û azadiyê rêxistinkirina civakê û tekoşîna piralî ye. Ev hêz bi gelê kurd re heye. Pêwîst e vê hêza xwe êdî derxe der û têxe pratîkê.

Her roj roja zimanê kurdî!

Kakshar Oremar



Li welatê me û bi taybetî jî li bakurê Kurdistanê serdemeke tije tirs a tunekirina nirxên ku nasname û mayîna me bi wan ve girêdayî ye, êdî gehiştiye xêzên sor ên sînorê xwe! Dijmin ji hêlekê bi hêza aborî-siyasî û ji hêla din jî bi rêya teknîka ragehandinê weke "ava bin kayê" heta xwe gehandiye kore gundên nav dilê çiya û gelî-newalên kûr û dûr ên Kurdistanê jî. Bi rêya rêzefilmên sedan beşî peyamên xwe yên olî-siyasî û ji wê xerabtir jî heza ji zimanê tirkî di nav dil û mejiyê zarokên kurd de şên kiriye.

Li hemberî vê sisyaseta tunekirin û talakirinê ji hezaran dengên ku di singan de hatine fetisandin, kêm kes hene ku heta bi qêrînekê dijberiya xwe bidin xuyakirin. Hemû qêrîn di gotinên bêpatin de xeniqîne. Yên "dibêjin lê napêjin" tenê li ser torên civakî qehremanên Facebook, Twitter, Telgram û rêyên din yên xwe nîşandanê ne. Berpirsên saziyên me yên ragehandinê ne tenê li nav welêt belkî heta li derveyî welêt jî piraniya civînên xwe bi zimanê tirkî dikin. Piraniya peyamên wan li ser dîwarên torên civakî bi tirkî ne!! Îcar bi wî zimanê bişaftin û tunekirina hemû nirxên kurdan şîreta li gel dikin! Ji wan dixwazin rabin ser piyan û li hemberî dagirkerî, înkar û talankarên serdest agir berdin canê xwe!! Hunermend û stranbêjên me di nav hunereke bêkarekter û teqlîdî de wenda bûne. Hinek ji wan jî li cihê afirandina berhemeke xwedî bandor ku civakê bihejîne û mejiyên razayî bileq-leqîne şîreta li xelkê dikin an jî bi peyamên siyasî kurdan li hemberî hev tûj dikin.

Min texmîn dikir ku ji sala 1995'an û şûnde ku MED TV dest bi karê xwe yê dîrokî kir, êdî tofana asîmîlasiyonê li her derê û bi taybetî jî di nav kurdên bakurê Kurdistanê da kete nav dilê goreke bêbinî. Mixabin hêvîyên wê şoreşê bi hemû geşbûna xwe ya wan salan ji sala 2000'î û pê de çilmisîn. Dagirkeran bêtir ji kurdan peyamên MED TV famkiribûn û li hemberî wê ketin ger û xebateke piralî. Êş pir giran û derman jî heye lê xemsariya berpirs û birêveberên saziyên kurdan hêşta jî nebûye sedem ku pêngaveke mezin û xwedî bandor bê hilanîn. Gelo dibe ku ev rewş wiha bidome?!! Gelo nabe ku em ji xwe bipirsin: "Li Mezopotamiyayê çend neteweyên xwedî împeratorî, dewlemendîyên piralî û desthilatdar hebûn?! Sedema yekê a tunekirina wan ji ku derê dest pê kir?,… niha ji şûnewar û bermahiyên wan komên etnîkî yên xwedî şaristaniyet çi maye?..."Gelo di sedsala 21´ê de em jî ketine ser rêya wê qedera reş a ku ew milletên mezin tê de çûn û niha tenê di muzeyan da navê wan maye?"

Rewşenbîr, sazî, partiyên siyasî, komeleyên perwerdeyê, ragehandin û siyasetmedarên kurd dema ku ji rastiyên civaka xwe xafil bibin, hingî nirx û bihagiraniyên hezaran salan dikarin di demeke kin de wenda bibin an na?!. Dîrok li ser sedemên têkçûna împeratoriya Medan gelek dersên baş bi bîra me tîne. Ka çavekî bi ser wê mêjûyê de bixişînin gelî hevalan.

Ji min re hemû rojên salê "roja zimanê kurdî" ne. Sedemên vê yekê pir in, çimkî bi vê rewşa heyî re ez weke metirsiyeke mezin pêşerojeke baş ji mayîna çand û zimanê me re nabînim. Zimanek ku xwedî dîrokek çend hezar salî li ser axeke dêrîn e lê di vê sedsalê da ger rewş wiha bi pêş ve here yê gelek derî li ber berdewamiya jiyana zimanê kurdî bêne dadan.

Li bakurê Kurdistanê roj ji rojê zêdetir xemsariyên di ber parastin û xizmeta ji bo zimanê dayikê re zêdetir dibin. Saziyên me bêbandortir ji salên berê karekî nakin ku bibine asteng li hemberî siyaseta înkar û asîmîlasyona dewleta Tirkiyeyê.

Ji sedî 52 axa Kurdistanê li bakur e û mixabin tevî hebûna 25 milyon kurdan di 20 salên bihûrî de heta niha pêngaveke pêşdeçûnê ji bo geşkirina zimanê kurdî nehatiye avêtin.

Birêveberên dewleta înkarger bi hemû rêbazan kar û xebat kirine û dikin ku ji teknîka moderen, torên civakî, TV, radîo, rêzefîlm û xwendingehên xwe li Kurdistanê sûdê distînin ku bi rêya zimanê serdest navbera du nifşên duh û îro mesafeyek zêdetir çêbikin.

Ev rewşa kambax yê heya ku derê bidome? Berpirsyarên vê yekê kî ne? Em hemû çawa dikarin bi rêya rexneyên ji xwe li pêşberî dijminên tunekirina xwe bibine asteng?

Di vê cîhana biçûk û tije îmkanên ragehandinê de her kesê ku xwe însan û xwedî wijdan dihesibîne, pêwîst e xwedîtiyê li nirxên xwe yên "hebûn û mayînê" bike. Nirxên ku di nav cîhana hemû komên etnîkî da "nasnameya me" ne. Weke Pêşewa Qazî û serok Ocalan gotine: "Ne xwe ji kesî bilindtir bibînin, ne jî xwe ji kesî kêmtir û biçûktir bihesibînin, çimkî em jî weke herkesî mirov û xwedî wan mafan in ên ew ji xwe re meşrû dibînin…"

Nivîskar û xwîner…

Alan Pîrê

Jixwe li welatê me heya demeke kurt jî zimanê me, kurdîya me ya kurmancî qedexe bû. Ev yek bêhtir ji bo bakur û rojavayê Kurdistanê wisa ye, ji ber ku li başûr û rojhilatê welêt rewş hinekî cuda bû.

Ez dikarim bêhtir li ser rewşa zimanê kurdî li rojavayê Kurdistanê biaxivin, ji ber ku ez bixwe ji wir im û ez baş ji rewşa kurdîya kurmancî li wî parçeyê Kurdistanê hayedar im.

Kurdî qedexe bû lê tenê kurdîya nivîskî û ya devokî heya radeyekê (li deverên giştî, bo nimûne: li sazîyên dewletê). Lê hebûn – di ser ku kêm bûn jî – yên ku xwe fêrî kurdîya nivîskî dikirin û berhemên nivîskarên kurd ên kevin û yên nû dixwendin; û hebûn yên ku dinivîsadin jî û bi şêweyeke giştî xwînerên kurdîya nivsîkî bi piranî nivîskar bixwe bûn. Ango nivîskar xwîner û nivîskar bûn di heman demê de, kêm xwînerên tenê xwîner peyda dibûn. Yê ku di destpêkê de xwîner bû, piştî demekê dibû nivîskar û hin nivîskar hebûn nema êdî li xwe datanî ji nivîskarên nifşê xwe re bixwînin (bi wan re mezin dibû! Lê çi mezin dibû, ji we re vekirî ye) lê ev rewşa han tenê ji kurdîya nivîskî re derbas dibû, ji ber ku hemû xwînerên erebîyê tenê xwîner bûn û kêm ji wan êdî dibûn nivîskar, ango ne hemû kesên ku berhemên erebîaxêv dixwendin, yekser piştî wê dibûn nivîskar û xwe dixistin rêza nivîskaran.

Em ê niha li vir ji xwe bipirsin, ka gelo çima? Çima xwînerên berhemên kurmancîaxêv bi piranî dibûn nivîskar, an jî xwe dikirin nivîskar û ev navê mezin bi dû xwe dixistin lê kesên ku pirtûkên erebî dixwendin, na? Ez ê li vir hewl bidim ku çend sedemên ku li gor nêrîna min sedemên sereke û navendî bûn, raçav bikim.

•Kurdî qedexe bû û ji ber ku qedexe bû, ne her kesî berhemên kurdî li cem xwe vedihewandin û ne her kesî jî wêrîbû wan pirtûkan bikire û bîne malê veşêre û carê li ber çavên xelkê derxe û bixwîne.

•Di nav kurdên rojavayê Kurdistanê de xwînerên erebîyê gelek bûn. Kurdan gelekî dixwend û di gelek malan de jî pirtûkxaneyên biçûk peyda dibûn. An pirtûkên sîyasî bûn, an yên wêjeyî bûn (wêjeya erebî û ya cîhanî bi piranî) û an jî kêm zêde olî bûn. Lê kêm hebûn yên ku pirtûkên kurdî yên bi tîpên latînî li cem wan bi girseyî peyda dibûn (ji ber ku Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û Melayê Bateyî ne gelekî qedexe bûn). Tîpên latînî dibe ku sedemeke din be, ji ber ku xwendin li Sûrîyeyê bi erebî bû û tîpên erebî dûrî yên latînî ne, û vê yekê jî kêm zêde roleke neyînî lîst.

•Kesên ku dikarîbûn bi kurdî bixwendana, mirov bi çavekî mezin li wan dinêrî û yekser mirov digot: ev kes an sîyasetmedar û partîzan e, an jî nivîskar e. Xwendina bi kurdî wê çaxê tiştekî mezin bû û ji ber vê yekê, hema çi kesê ku bi kurdî bixwenda, dinivîsand jî. Ji ber ku heger gelekî ji zimanê kurdî û ji xwendinê bi şêweyekî giştî hez nekira, xwe nedixiste vê metirsîyê û pirtûkên kurdî li cem xwe venedişartin û ew nedixwendin.

•Xwînerên kurdîyê kêm bûn û hîn jî kêm in, ji ber ku pirtûkxaneya kurdî xizan e û kî tê li berhemekê digere nabîne, dibêje tune ye, ez ê wê berhemê li pirtûkxaneyê zêde bikim. Diçe xwe fêrî kurdîya nivîskî dike û yekser dibe nivîskar, û navê nivîskarîyê jî bi dû xwe dixe. Lê heman kes ya xwe di zimanê erebî de nabîne, ne her kes dikare bi erebî binivîse, ne ku nivîskarekî baş be. Lê kurdî belengaz e û her kes lê siwar dibe!

Gelek hene dinivîsin, bi taybetî helbestan dinivîsin, ji ber ku helbest ya herî hêsan e û kurdî bixwe zimanekî helbestî ye. Hema dêya nexwendî li ber dergûşê gava ku ji zaroka xwe re dilorand deh helbest diafirandin. Pîrekan berê li ber destar deh helbestên stranî diafirandin. Jin û mêr gava ku diçûn paleyê, stranên paleyê digotin, yek û du û deh û hemû jî nû bûn.

Mixabin berhemên baş kêm in, ji ber ku xwendina bi kurdî kêm e. Û ez dibêjim divê ku em niha bêhtir nivîskarên xwe yên serkeftî bixwînin, ji bo ku em bihêlin ew bibin nivîsakrên xwedî xwîner û em jî bibin xwînerên birastî. Ji ber ku li gor reşwa heyî gelek ji me ji her duyan mane, em ne nivîskarên baş in û em ne xwînerên baş in. Îcar xwînerekî baş be, çêtir e ku tu nivîskarekî seqet û binketî be.

Wa merg biqedîyo…

Nevîn Alkan

Endamê Grup Yorumî Hêlîn Bolek û Îbrahîm Gokçek pîya semedo ke deyîranê xo azad bivajî û konseran bidê, semedo ke tedaya dewlete ya vera hunerî biwedarîya kewtbî rojeyê mergî. Hunermendan ra Hêlîn Boleke roja 288ine ya rojeyê mergî de dinyaya xo bedilnaye û polîsan hêrişê merasîmê cenazeyî kerdbî. Îbrahîm Gokçek zî 7ê gulana 2020î de roja 323. ê rojeyê merdî de şehîd kewt. Gokçek Goristanê Halef Hoca yê qezaya Talasî ya Qeyserî de ame definkerdene û şewa eynî roje de nîjadperestan hewl dabî hêrişê gorê Gokçekî bikerî. Polîsan cenazaya Gokçekî Cemxaneyê Gazî de girewtbî binê ablûqa û xeylê kesan tepiştî. Eynî çîyî merasîmê definkerdişê Boleke de zî ameyî cuyayene û xeylê kesî ameybî tepiştene.

Badê şehadetê nê wirdî xoverdayoxê hunerî çi heyfo ke dewlete vera grube de vindetişê xo nêbedilna û reyna zî konseranê Grup Yorumî asteng kerd. Teda zilm, hêriş û swb. her çî dewam kerd. Xoverdayoxê winasî kêm yenî rîyê dinya. Ganî xoverdayîşê înan biameyêne dewamkerdene û talebê înan biameyêne qêrayene. Xora ê şîyî la çi destê kamî ra seba cuyayîşê înan nêamekerdene. Eke şar sey înan xover bidayêne û xoverdayîşêko gird biviraştêne do ewro Grup Yorume bieşkayêne hercayê Tirkîya de konseranê xo bida û deyîranê xo bivaja. Nê merdimî raştî zî çîyo ke xeylê kesî nêeşkenî cesaret bikerî vajî, pê ardî. Xoverdayîşê înan bî tarîx û efsane. Peyêna peyên canê xo zî seba şarê xo û azadîye feda kerdî.

Kêmanîyê ke şehadetê Bolek û Gokçekî ra dima virazîyayî wa ê Ebru Tîmtîke de dibare nêbî. Vizêr şand Avûkat Ebru Tîmtîka ke tewrê Avûkat Aytaç Unsalî pê waştişê hukmkerdişê edîlî rojeyê merdî de bî, roja 238. ya rojeyê mergî de şehîd bîye. Eke xoverdayîş tena serê milê çend kesan de bimano xora dewlete ê kesan çiman ra vejena û vengê ke bivejî zî birnena. Raştî zî wexto ke mi xebera Tîmtîke girewte ez zaf pê qehirîyawa. Nê merdimî seba şarê xo û azadîye canê xo feda kenî û mergêko dejin tercih kenî. Çîrê ê ke manenî xo tay nêkenî herinda înan û hertewir dejê înan fehm nêkenî. No bêhîssîye vera her roje canê ercîyaye yew bi yewe dest ra şonî.

Xebera şehadetê Ebruye de mektuba aye ame mi vîr. Ebru Tîmtîke zîndanî ra pê serrnameyê 'Mi

bêrîya Dêrsimî kerde' mektubêk erşawitbî. Tîmtîke mektuba xo de wina vatbî: "Eke ez bêra veradayene, ez cade şona Dêrsim. Heta ke ez nêşora ewja, ez weş nêbena. " Wa rayîrê to akerde bo Tîmtîke. Şo caûberan û koyanê azadan de sey mîlçikek bifire. Ma nêeşkayî to tîya de weş bikerî. Ma nêeşkayî na dinya de Hêlîn Bolek, Îbrahîm Gokçek û to bidî cuyayene. Ma nêeşkayî bibî layiqê xoverdayîşê şima û seba talebanê şima çi ma dest ra ame ma nêkerd.

Ma umud kenî ke abubetê nê kesan nêro serê Aytaç Unsalî û talebê înan bilez bêrî caardene ke êdî kesêk dest ra nêşêro/a. Ganî rayapêroyî seba caardişê taleban û cuyayîşê Unsalî werizo payan ser.

Ti nameyê pêyxamberê axir zemanî hesîyaya pê?

Mehmet Seyîtalîoglu

Ya.

Belkîyayî cira pers kerdbî.

-Ti kam a? Îta de çi pînena?

Hurîye vat ke;

-Hêq û talay ez tayin kerdo ke kamcî het rê zêdeyînê û kamcî hetî rê kemînê lazim a? Ez aye cadî.

Belkîyay vat ke;

-Ti çend serrî der a? Aye vat ke;

-Di sey serrî ra zêde esto. Di sey pancas serra ez esta.

Belkîyay vat;

-Ti tawa nameyê pêyxamberê axirê zemanî pêhesîyaya? Aye vat;

-Nê. Hatanî nika çîye de nîyanên nêhesîyo pê. La ti ke zaf wazena. Şo falan ca uca de wayêde mi esta. A çar sey serrî de zêde şîya. Beno ke a bihesîya pê. To rê vaja.

Belkîyayî cira xatirê xo waşt. Terkit şî. Zaf şî, şenik şî. Edî nêzano çixa şî se. Werhasil şî koyêde berz de vejîya. Seyr kerd ke. Horîye hawa uca de. Destê xo yo ju asmên der o, destê xo yo bîn hard der o.

Vat;

-Ma bi xer dî.

Aye vat;

Xêr mîyande bê. Xêr amey.

Hal û demê jubîn pers kerd. Belkîyayî vat;

-Ti îta de çi pînena? Sere sirret o çik o?

Aye vat;

-Ez ebe emrê hêqî ita de nobete gêno. Tamara dinya mi dest der a. Pukelêk û guvelokan gêna. Pê ke zerar nêdo dinya û dar û ber o. Goranê cayî be cayî vayê tezî vay dano. Bereketê dinya keno zêde keno kêmî. Karê mi kî no yo.

Belkîya na hîkmete re şaş bî. Çi vanî çerebîyayena hêqî de nîyadana. Horîye destê xo asmên ra na ro. Vat;

-Ya Belkîya hêq û tala dinya de hona zaf çîya ro wahîr o. Benî adem nêzano. Hawt katî binê hardî û serê hardî ro çi esto, çi çîn o insan hona pê nêzano. Nê hawt mîna ser û binê dinya destê ma de zey hewûka saye aseno. Qudrete cenabê hêqî henên hawa ra findenê. Hawa ra çêrexînê. Werte nê hawt qatanê ser û binê dinya de ke new çerxê felekî estê. New mîna çerx û dewranê xo de fetelînê, tim tim çerx danê. Dinya şima kî nînan ra ju ya. Serranê mi ke persena çar sey serre emrê mi derbaz kerdo, mi de şîyo.

Belkîyayî vat;

-Ti nameyê pêyxamberê axir zemanî hesîyaya pê? Va ke;

-Nê. Ez ke nêhesîyo pê. Oncîya kî bê şo filan ca de ju waya mi esta. Aye de sesey serre şîya. Beno ke a bizana û to ra vaja.

Belkîya uca ra kî uşt ra şî. Şî ju mekanê de vejîya. Seyr kerd ke her ca kûlîlîk o. Dar o, ber o. Reng o, reng o. Pêr o, pir o. Binê ju dare de nîşt ro. Xo, xo re vat ke;

-Eceba, no mekanê kamî yo?

A waxt vengêde teyre goş ro şî. Verê xo de dare ra seyr kerd ke; teyrêda henî rindeke nîşta ra gilê dare ra. Zerrî û can ra wanena. Henî rindek henî nêqeşyayîya. Rindekîya xo dayo vengê xo kî. Wendîşe xo henên o ke ti qayîla ke goş serna. Teyre ameye ra zon. Selam day jubînî. Belkîyay pers kerd;

-Ti senî teyrêda binbarek a û nîya rindek a?

Teyre vat ke;

-Ez hurîya Tawiz a.

Pers kerd. Vat;

-Îta mekanê kamî yo? Nîya rindek o?

Teyre vat;

-Mekanê Xizir Nêbî yo. Waxto ke o vejîyo bêro.

Belkîyay pers kerd;

-Ti çi ra henî zerre ra wanena.

Teyra Taws vat ke;

-Derdêde mi esto ke ez nîya zerra xo ra wanena. Ez cenet ra fîto dûrî. Aye ra nîya zerre ra wanena. Cenet kî zaf rindek bî. Ez ge gane cenet ra bîyêne teber. Xo rê henî şîyêne fetelîyayêne. Eke bîyêne tarî cêrayêne ra tepya ameyêne. Roje oncîya çêberê cenetî ra bîya teber ke xo rê şêrî bifetelîya. Ju ame leweyê mi. Mi ra vat ke;

-Ti çira henî rindek a!.. Çinay ra tenya fetelîna? Tenya fetelîyayêne rind nîya, ti mirena.

A waxt mi rê bi qisawete. Merdene çik a? Merdene nêzano çi ka? A waxt merdene mereq kerde, merdene çi ka. Mereq kerde. Ey vat;

-Merdene, merdene awa ke, to ra ruhê to vejîno, canê to tenya maneno. Şona binê hardî. Nameyê to nêmanêno waxtê ra tepya. Xo vîr ra bena.

Dime ra cira pers kerd;

-Ti kam î? Ey va ke;

-Ez Ferîşt o.

-Wazeno ke şêrî cenet bivînî. Ti ke mi bera zerre cenetê to ser o waneno. A waxt ti nêbena kal û kokim, ne kî bena nêweş, ne kî mirena.

Gêraya mi ci ra vat;

-No kare destê mi nîyo. Ez nêşikîno to berî cenet. Beno ke mar to bero zerre. Vinde ez şêri marî ra vajî. Ez gêro ya şîyo cenet. Mar dî. Mi qalê Ferîştî kerd, ci rê. Ti nêvana dima kî marî ra beno qudîşan no şono çeberê cenetî de Ferîştî vîneno. Ferîşto ke vanê Govelek be xo yo, marî ra xo eşkera nêkeno. Kuno fekê marî û binê zonê marî de xo dano we. Çêberê cenetî ra kuno zerre. No kar karê marî nîyo. Mor xêjya salixênî dana. Rojê govelek ancîya kuno binê zonê marî şono lewê Hawa Ana. Heq û talay cenet Hawa û Ademî rê cenet kerdbî tomete. Govelek binê zonê marî de Ana Hawa ra vano ke;

-Ana Hawa seyr ke heq nêwazeno ke şima nê cenetî de vinderî. Aye ra dara genê şima rê kerde tomete. Şima ra ver ju kul peyda kerda. Ey meyweyê a dare werdo. Ha hîrê sey hazar serra ke binê a dare der o. Ne beno nêweş, ne beno kal ne kî mireno. Bê şîme tey qesî bike.

Gowelek nay vano dizdeyna binê zonê marî ra vejîno rawer şono kuno tonêde kalê kokimî. Binê a dare de meredîno ra. Ana Hawa yena binê a dare seyr kena ke kalêde kokim ha uca de xo rê meredîyo ra. Ci ra pers kena; vana;

-Ti kam î, çi kî, çi kes a? Kal vano;

-Ez kî qulêde hêqî yo. Hîre sey hazar serra ver heqî ez peyda kerda. Mi rê meyweyê na dare kerdîbî qedexe. La ancîya kî mi meyweyê na dare tam kerd. Na hewtay serra ke mi rê taway nêbeno. Ana Hawa kî xapîye. Aye kî meyweyê na dare tam kerd. Ci rê tawa nêbî. Şîye lewê AdEmî. Aqilê Ademî kî ci ra girwet. Vat ke;

-Bê Adem ti kî meyweyê na dare ra biwere.

(Ademî saye werde, ya kî!....)



Zarokên Fatê

Rojek ji rojên zivistanê Fatê û sê zarokên xwe di hundur de bê ardû û bê nan û xwarin dimînin.

Zarok digirîn dibêjin yadê me sar e, em birçîn e.

Fatê dirêj dirêj difikire lê çareyekê nabîne.

Zarokek xwe li pişta xwe dişidîne û bi destê her du yên dî digire û bi şimika naylon û bê gore berê xwe dide mala bavê xwe.

De em biçin dema ku xwarin danîn, ez ê bêjim zarokno ma hûn birçî ne?

Hûn ê bêjin na.

Ez ê bêjim de werin bixwin û em ê zikê xwe têr bikin û xwe germ bikin û piştre werin malê.

Dema ku Fatê digihê serê kolanê bala xwe didê ku li serê kolanê dawetek heye.

Û hevserê wê Silo di serê govendê de xwe hiltîne û li erdê dide.

Fatê bi matmayî lê dinêre lê ew qet bala xwe nade Fatê û reqsa xwe didomîne.

Fatê li mala bavê xwe zikê zarokên xwe têr dike û êvarê berê xwe dide malê.

Silo êvarê dema ku tê malê şîvê naxwaze.

Fatê jê dipirse: Ew çi govenda te bû Silo?

Silo bersivê didê: Keçê min pir sar bû û ez birçî bûm. Min xwe kil dikir ji bo ku ez germ bibim û min bi nanê dawetê jî zikê xwe dagirt, de hê tu çi ji min dixwazî.

Fatma Taşli

XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Cemidî 3. Demeke rojê 5. Êzing
6. Bajarekî rojhilatê welêt 7. Alî, rex 9. Oldar 12. Xwarineke navdar a çîniyan, gelekî tûj e 14. Notayeke muzîkê 15. Ne buhabûn, buhayê kêm
17. Cihê ku tê de karê çûn û hatinê pêk tê 18. Tûj, sor
22. Dilsozî, wefadarî

JI JOR BER BI JÊR

1. Binê lingê hesp û keran û hwd
2. Navekî kurdî yê jinan, bi wateya rûgeş, rûxweş 3. Dûxan, dûman 4. Bersiva neyênî 5. Danekî rojê, piştî nîvroyê 7. Rihetî, ne bi zehmetî
8. Cesed, beden, term 10. Roja em tê de ne 11. Meha cejna Newrozê
13. Welatekî ku herî zêde bi darvekirinan tê zanîn
14. Zanyarekî bi nav û deng, xwediyê teoriya peresanê 16. Ji enîşkê heta qefdika dest; milê jêrîn; her wiha navê kovareke kurdî ye
19. Amûreke mûzîkê 20. Daxwaz, armanc 21. Sewaleke kedî ku bi keriyan tê xwedî kirin 23. Agir

Bersiva hefteya borî

Çend Kurteqerf

Dildarê Amedê

Şîretên Xalo

Got Xalo, zewac çawa ye ma tu dibêjî ez bizewicim an nezewicim?

Xalo got: Kuro lawo welehî zewac wek koronayê ye.

Lawik got: Çawa wek koronayê ye.

Xalo got: Ji ber 14-15 rojên pêşî tu bi tiştekî nahisî û kêf kêfa te ye lê piştî wê îca nefesa te teng dibe, sînga te hişk dibe, êş dikeve serê te û pişta te.

Xwedê wekîl be jiyan li te heram dibe.

Çavên kalo nabînin

Kalo got: Kuro layê kûçikan tu yê kê yî?

Lawik got: Ez im yabo.

Kalo got: Wey xwedê te kuşto, tu çi li nav dest û piyan digerî.

Te hişt ez çêran ji xwe re bikin hey dehşikê kerê.

Ez ê bi ku de herim?

Bekiro ajkarê teksiyê bû û her roj qeza dikir.

Polîsê trafîkê: Kuro te çawa qeza kir, ma firêna erebeya te tune bû?

Bekiro: Erê weleh min firên girt jî dîsa lê qelibî.

Polîsê trafîkê: Careke din tu qeza bikî ez ê vê carê te bigirim.

Bekiro: Temam ji îro şûn de ez ê hem firênê baş bigirim hem jî li tûtûkê bixim.

Polîsê trafîkê: Kuro dîsa tu yî, te dîsa qeza kir? Ma qey tûtûka te tune bû tu wî haydar bikî?

Bekiro: Erê wele min li tûtûkê xist û nexist mêrik xwe neda alî.

Polîsê trafîkê: Ji mêrik dipirse, ma bi rastî ji te re li tûtûkê xist û te xwe neda alî?

Mêrik: Erê li tûtûkê xist rast e lê heyra ez li dikana xwe rûniştibûm, ma ez ê bi ku de herim!

Sîdar Jîr

"LeYLaN" Mistdana Ruhê Civakê ye

Wext tê û mirov li kodên ruhê xwe yê cîvakî rast tê û êdî naxwaze wan kod û şifreyan ji bîr bike… Di hemû qonaxan de dema mirov bala xwe didê jibîrbûn yan jî jibîrkirina kodên jiyana civakî, bi bindestîyê re dest pê dike û jibîrkirinê bi lez dike. Civakên bindest gelekî dilzîz û hesas in, rastîya wan anku jiyana wan pirî caran dibe sedema acizîya wan. Lewma jî hewcetîya ruhê civakê bi mistdanê heye. Gelek caran rêya vê yekê huner e, edebîyat e…

Mistdana ruhê civakê, bêyî ku civakê aciz bike, bêyî ku rê li ber dûrketina ji xwe vebike karekî gelekî hunerî ye. Ji ber vê yekê hunermend/nivîskar xwe didin bin barekî gelekî giran. Berhemên edebî dibin amûrek ku nivîskar pê ruhê civaka xwe mist bide.

Hostetî û şarezatîya nivîskar, di berhemê de parzûnkirineke bi hostetî û şarezayî ya rastîya civakî ye. Ew huner e, guhdarîkirina li dengê dil û dengê ruh e.

Romana Devliken Kelogirî ya bi navê "LeYLaN" yek ji wan berheman e ku bêyî acizî û dûrxistina ji rastîya xwe, bi xwendineke ji dil xwîner didin pey dengekî gelekî henûn, didin ser şopa rûyekî gelekî nas. Bêyî hemdê xwe, wekî rolêgerîyayîyan li wî dengê henûn û rûyê nas digerin. Di vê lêgerîna xwîneran de, nivîskar bi wan dide hesîn ku tiştê lê digerin ruhê wan bi xwe ye.

Devliken Kelogirî li ser zemîneke ne reş û spî lê heta tu bibêjî gelekî rengîn romana xwe nivîsandiye. Loran, Alîce, Doktor Dîno, Çeçanê Kej, Hisênê Melesê, Kendal, Şerefxan, Xeto, Sîyabend, Tîrêj, Tahirê Lorî, Cornelîa, Sîtav, Esmîna, Evdalê Dewrêş her yek ji wan di romanê de rengekî jiyanê ye. Ji serhildêrî û hêvîyê bigire heta serserîtî û feylesofî, ji bêxwedîtîyê bigirî heta humanîzm û femînalîyê, ji ruhê bindestê dîn û bîrdozîyê bigirî heta paqijî û pakbûnê û heta ruhê tolazî û fahîşetîyê û afirînerîyê hemû leheng/tîp/karakter gelekî çalak in…

LeYLan, ji serî heta binî bi motîfên jiyana Kurdan a rastîn hatîye sêwirandin û têra xwe zindî be jî Devliken Kelogirî di gelek beşên romanê de, dike ku xwîner li ruhê xwe rast werin û muhakemeya jiyana xwe bikin. Ew jî kêlîkên herî pîroz in, bêdengî ye, qîrîneke hundirîn, herîkîna aveke xweş û serxweş e… Ew bêdengî kêlîka rasthatina li ruhê xwe ye. "Deng jê nedihat, tenê ew û dilê xwe bûn û li ber senfoniya xuşîna avê li dengê dilê xwe guhdarî dikir"(rp 95). Loran ku di "LeYLaN"ê de gelekî çalak e car bi car di wan kêlîkên pîroz de, xwînerên dane ser şopa rastîya xwe jî li ber avekê, li binê darekê dide sekinandin û mit dike…

Devliken Kelogirî bi romana xwe "LeYLaN"ê, heger gotin di cih de be çep lê dixe rast vedigere. Her çiqas di gelek beşan/sahneyan de bi erotîzmeke dêrîn mijarê vedibêje jî zemîna sereke ya berhemê, lêgerîn û paqijkirina gemara bi sedsalan a li ruhê civakê ye. Erotîzmê wekî amûrekê tercîh kiriye û bi kar anîye. Belkî jî li gorî gelek nivîskaran ev rêbaz ji bo hazirkirina xwîneran rê û rêbazeke xurt be. "Di bin wê bêdengiya şevê de ji bo kêfa wan li wan nebe qebhet, heta ji wan dihat bi nalînên xwe re dixeyîdîn, lê çendî bi malînên xwe re dixeyîdîn jî di bin senfonîya xwezayî de ku beq û çirçirkan davêtin ber hev, nalînên wan jî mîna melodîyeke nerm di bin re bi dengê xwezayê re armonîyek xweş çêdikir." (rp.14) Dema em vê sahneyê dibînin û dixwînin û piştî wê bi çend paragrafan jî "Pirê kesan navê Dewrêşê Evdî, Memê Alan, Rustemê Zal, Elîkê Betê, Hesenê Mala Mûsa, Bişarê Çeto, Cembelî û Binevşa Narîn, Sîyabend û Xecê di van civat û şevbihêrkan de bihîstin. Û her yek ji wan lehengên navdar û evînê ji bo wan dibûn xeyal û bi wan xeyalan radiketin û radibûn." (rp 15) dixwînin êdî mirov têdigihîje ku nivîskar ne bi tesadufî lê bi hostetî vê yekê dike û xwînerên xwe gelekî bi konetî amadeyî puxteya beşên romanê dike.

Devliken Kelogirî bi vê romanê hem derê dêrîn ê li ser civakê quflekirî bi dengê xwe yê hundirîn vedike, hem jî rê li ber şabûneke ruhî vedike.

***LeYLaN, Devliken Kelogirî, Roman, 293 rp, Weşanên J&J, 2019**

Valahiyê dadigire

Li Êlihê piştî ku qeyûm Sînameya Yilmaz Guney a Şaredariya Êlihê hilweşand komeke ji kesên pîşeyên curbicur di sala 2018'an de Şanoya Yenî Sahne ya Êlihê ava kir. Di nav wan de tenê Erdal Kaya xwedî perwerdeya şanoyê ye. Piraniya lîstikvanên din mamoste, parêzer, xebatkarên tenduristiyê ne. Piraniya lîstikên li Yenî Sahneyê bi kurdî ne. Hin lîstikên ku bi zimanên din jî li kurdî wergerandine hene.

Lîstikvan Kaya dibêje armanca wan ew e ku pêşiyê li pişaftinê bigirin û têkildarî armanc û xebatên xwe van tiştan tîne ziman: "Yenî Sahne valahiyê dadigire. Hewcehiya êlihiyan bi vê hebû. Lîstikên me ew fikra, 'ez bi kurdî li lîstikê binêrim jî tiştekî fêm nakim' rakir. Mirovên ku digotin ez nizanim bi kurdî biaxivim jî piştre malbatên xwe bi xwe re anîn. Di rastiya xwe de şanoya kurdî ji mêj ve di jiyana kurdan de heye. Şanoya Bajêr a Amedê ji mêj ve heye. Li Stenbol, Wanê heye û van demên dawî bandora medyaya civakî çêbû û Êlih di qada şanoyê de êdî ne dûrî Stenbolê ye. Me asîmîlasyon kire hedef. Sedema herî sereke ya şanogeriya me ev e."

Kaya got bi Şildim Bildimê di vê pêvajoya pandemiyê de hewl dane ku valahiya heyî dagirin, got wan heta niha 12 beş çêkirine, di meha îlonê de ew ê dîsa dest pê bikin. ***ÊLIH***

Pirtûka êş û bêrîkirinê

Pirtûka bi navê "Êşname" ya helbestvanê kurd Kadîr Çelîk ji Weşanên Payîz derket. Pirtûk ji 223 rûpelan pêk tê û nêzî 200 helbest tê de hene. Berhema Çelîk li pirtûkxaneyên kurdî li benda xwîner û helbesthezan e.

Helbestvan Kadîr Çelîk der barê pirtûka xwe de dibêje ew bêtir ji helbestên kin hez dike û li dinê her ku diçe helbestên dirêj kêm dibin û niha terendek helbestên kin dest pê kiriye. Çelîk destnîşan dike ku divê helbestvan merama xwe bi kurtahî bîne ziman û her çiqas helbest kin be jî divê peyama xwe bîne ziman da ku tîna dilê xwîner bişkîne.

Çelîk dibêje pirtûka wî ya "Êşname" ji êş û bêrikirinê pêk tê û bi giştî helbestên wî li ser êş û bêrîkirinê ne. Çelîk got ku ew di helbestan de derberînên xwe tîne ziman û ew diçe ku êş û bêrîkirin pê re ye. Çelîk da zanîn ku ew ji biçûkatiya xwe ve ji helbestê hez dike û salên dirêj e helbestan dinivîse. Çelîk dibêje ku ewilî bala wî li ser helbesta klasîk bû û paşê jî dengê bayê helbesta nûjen a efsûnî lê daye û wî dest bi helbesta nûjen kiriye. Çelîk got ku zimanê kurdî û helbest li bejna hev tên. ***AMED***

'Bi zimanê dayika xwe bistirên'

Mahabad Olmez a 23 salî ku ji Cizîra Şirnexê ye ji zarokatiya xwe ve ye bi muzîkê re eleqedar dibe. Jina ciwan Mahabad dibêje ji ber ku li malê xwişka wê li tebûrê dixist gelekî bala wê dikişîne, wê jî pir xwestiye lê bixe.

Olmez dibêje di heman demê de birayê wê jî li gîtarê dixist û ew bi serê xwe hînî lêxistina gîtarê bûye.
Olmeza ku di 15 saliya xwe de koma xwe ava dike derdikeve ser dikê strana dibêje û wiha diaxive: "Divê em xwedî li çand û hunera xwe derkevin. Bi taybetî jî ciwan. Bi zimanê dayika xwe stranan bêjin. Li dijî qedexeya li ser ziman, tunekirina ziman divê em bi zimanê xwe biaxifin û bi zimanê xwe stranan bêjin. Ya rastî ciwanên kurd êdî guhê xwe nadin stranên bi kurdî. Ev tişt nayê qebûlkirin."
ŞIRNEX

Bi projeyeke nû li ser dikê ne

Şanoya Bajêr a Amedê ji ber şewba koronayê demeke dirêj navber da kar û xebatên xwe yên li qadan. Lê li ser medyaya civakî bi qasî derfetan xwe gihand temaşevanên xwe. Şanoyê piştî ku rewş asayî bû xebatên xwe dîsa berdewam kirin û niha bi projeyekê amadekariya bernameyeke nû dike. Şano xwe amade dike ku bernameyeke skêçan li ser ekranên televîzyonan bide weşandin. Derheqê vê projeyê de şanogeran nirxandin kir.

Endama Şanoya Bajêr a Amedê û lîstîkvan Zeycan Ateş diyar kir ku ew ji bo projeya nû bi kelecan in û wiha got: "Niha projeya me ya bernameya televîzyonê heye. Her hefte em ê beşekê di televîzyonê de bidin weşandin. Em bi kelecan in."

Endama Şanoya Bajêr a Amedê û lîstîkvan Şahperî Alphan jî bi lêv kir ku ji ber pandemiyê xebat û projeyên wan nîvco mabûn û wiha axivî: "Projeya me li gorî şert û mercên pandemiyê wê bê meşandin. Niha bernameya me ya skêçan heye. Skêç piranî bi koman tê berdewamkirin. Bernameyeke me ya bi navê 'Henekhenek' heye kesê bixwaze dikare sikêçên binivîse bişîne navnîşana wê bernameyê. Hê dîroka pêşkêşkirina projeyê ne diyar e lê di demek nêz dê em ê diyar bikin."

Endama Şanoya Bajêr a Amedê Sîdar Aslan jî anî ziman ku şano bê temaşevan nabe û wiha got: "Ji ber pêvajoya pandemiyê em zûde derneketibûn sehneyê. Ji ber wê me xwest ku em rêya televîzyon û medyaya civakî xwe bigihêjin temaşevanên xwe. Ev hem ji bo me û hem jî ji bo temaşevanan gaveke biwate bû."***AMED***

xwebûn

31 Tebax-6 Îlon 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 37

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazıişleri Müdürü: İdris Gürmez
Yayın Danışma Kurulu: Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Yayın Türü: Haftalık Yaygın Süreli
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

Ez mîsantropîs im!

Hogir Ar

Derûnnasî yan jî psîkolojî, zanîna li ser qanûn, pêşveçûn, rûdan û çalakiyên derûnî yên mirov e. Derûnnasî, zanîsteke nû ye ku li ser rûyê cîhanê belav bûye. Heya destpêka serdema 20'emîn jî wekî dîsîplîneke biyolojî, felsefe, bîjîşkiyê û hwd. bû

Derûniya civakê

Cîhan 4,5 milyar salî ye. Li gorî lêkolînên dawî yên ku pênc fosîlên nû yên Homo Sapiens (mirovên nûjen) ên li Afrîkaya Bakur tên dîtin; anatomiya mirovê îroyîn berî 100 hezar -300 hezar salan çêbûye û 50 hezar sal in ku reftara modern a mirov diyar bûye.

Di pêvajoyên civakbûnê de, fêr dibe ku bibe endamê civaka xwe. Pîvanên tevgerê ku ji hêla civaka wî ve tên pejirandin, nirxên bingehîn ên civakî û çandî ne ku, şikil û şêwaza tevgera mirovan diyar dike.

Pêvajo hem ji bo hebûna civakan û hem jî kesan pir girîng e. Ne gengaz e ku civak bi rengekî bitendurist mezin bibe û bi domandina pergala ku dîktatoran afirandiye bi wê civakbûnê ya bitendurist jiyana xwe bidomîne.

Sosyalîzasyon

Sosyalîzasyon, têgîneke zanistî a civakî ye. Ji aliyekî ve, pêşketina kesan bi navgîniya ragihandinê bi kesên din an derdorê civakî û fîzîkî re; ji aliyekî din ve, ew peywirên ku di dema civakbûnê de çêdibin kes tê de diyar dike. Ew li ser kesayetiyan û her weha bandorên nexşandî, tedbîrên armanc dar û sîstematîkî (perwerdeyî) digire. Pêvajoya civakbûnê tevgerên kesane (kolektîfkirin) û rêwerzên çalakiyê (nasnameya civakî) di jiyana hevpar de pêk tîne.

Mixabin bi qanûn, qedexe, neheqî û nijadperestiyê, civakeke mîsantropîst ava kirine.

Mîsantropî nefretkirina mirovan e. Li gor psîkologan nexweşiyeke derûnî ya antî-humanizmê tê hesibandin lê ez ne bi vî awayî dinirxînim.

Bavek dikare kurê xwe bike mîsantropîst an jin dibe dikare ji herkesî nefretê bike. Derûniya mirov hesas e, ji ber vê yekê zû teşe digire. Ji bo ku civak hebûna xwe biparêzin pêwîst e jiyana xwe ya siyasî, civakî, aborî, çandî û teknolojîk organîze bikin. Nirxên civakî bi fikr û afirîneriya hezar salan çêbûne. Hebûnên dîrokî bûne sedema qonaxên nû. Loma jî dewlet an serwerên serdemê hez ji mihalefetê nekirine û nêrîn û helwestên dijber asteng kirine. Qedexekirin rêbazeke sereke ya sansûrê û têgîneke dadî ye. Her wiha di şerê psîkolojîk de jî tê bikaranîn.

Tirkiye jî di warê sansûr û qedexekirinan de gelek navdar e. Ji avabûna komara Tirkiyeyê ve, ziman û çanda kurdî û saziyên kurdî her tim hatine qedexekirin û bi vî awayî 'kurdekî nû' hatiye afirandin. Ev kurd, kurdekî mîsantropîst e ku kesê wî qedexe dike li pêşya wî her tim asteng datîne û hebûna wî tune dihesibîne.

> Derûniya garanê mêjiyê civakê ditevizîne. Em bandora vê yekê, bi taybetî di siyasetê de, di gelek waran de dibînin

Car caran dema di televîzyonê de nûçe derbas dibin, zarok çêr û pêçariyan dikin; an dema mijarên polîtîk derbas dibin li qehwexaneyan bi sendeliyan li hevdu dixin. Îro ne tenê kurd, bi gelemperî li cîhanê binêrin her dîktatorek civakeke mîsantropîst ava kiriye.

Derûniya garanê

Derûniya garanê di sala 1848'an de ji bo pergala siyasî ya amerîkî tê bikaranîn. Palyaçoyeke bi navê Dan Rice di demên rêwîtiyê de li ser rêwîtiyek bandwagon dikir. Otomobîla bandê bi muzîka dilşewat derbasî tûrîstan bû û bi dirûşma "beşdarî bandê bibe" bala wan kişand. Ji ber populerbûna wî, wî di hilbijartinan de serkeftineke mezin bi dest xist. Ev bûyer li ser vê ramana bingehîn e û ji ber vê yekê ji psîkolojiya herdemê re bi îngilîzî "Bandwagon Effect" tê gotin. Li gorî zanista psîkolojiyê; ev nav li ser bingeha rêgez û mercan tê danîn ku hin bawerî di nav komên civkê de bi cih dibe. Li vir tişta sereke ev e ku kes li gorî nêzîkatiya rastiyê ya piraniya gel wê rastiyê qebûl dike û baweriya xwe pê tîne.

Yek ji wan sedeman ev e ku mirov ji ber tirsa ji tenêtiyê dikeve nav civakê û li gorî derûniya garanê tevdigere. Heke hişê me bi tirsan neyê dagirtin, em ê her gav bi aşkere bifikirin û fikrên xwe vebêjin.

Derûniya garanê mêjiyê civakê ditevizîne. Em bandora vê yekê bi taybetî di siyasetê de, di gelek waran de dibînin. Em dikarin bi hêsanî vê têgînê wekî xalîçeya civatê binirxînin û xwe neçarî komek mezin an jî dîktatoran nekin.

Em newêrin dengê xwe derxin. Hilbijartina vê riya şaş, piştî demeke dirêj bêtir zirarê dide. Ji dengên cuda netirsin da ku hûn dikaribin rastiya rastiya xwe biparêzin!

Hilweşandina Civakê!

Pirsgirêkên civakî gelek in û civak tê hilweşandin. Gerdûnîbûna rûxîneriyê, hebûna xwe di warê siyasî, aborî û çandî de dide hîskirin. Ev tenê şêweyek ji sazkirina kapîtalîzmê ye.

Ev têgîn mîna bûqalemûnan e ku xwe li gorî her rewşê dikare biguherîne. Mirov hema bi vî awayî tên dorpêçkirin lê haya wan jê tune ye.

Dema ku tên Kurdistanê bi rêbazên xapandinê çarikan didin serê xwe, piştre dayikên aştîxwaz li kolanan qetil dikin. Ev hilweşandina civakê ye!

Ev yek bi sedan salan e pêk tê. Dejenerasyona çandî civak û hiş ji desthilata hêza olî xilas nekir û bû hilweşîna civakî. Rejîma dîktator ku di nav gel de pêk hat û bû "kuştina girseyî", bi dawî bû. Ne ew dibin şivan û ne em gavan û gopal!

Sûka Kfar-boranê

Bêrîvan Kayî

Li gorî çavkaniyên arkolojiyê ji bo ku jîngehek bi statûya 'bajêr' bên pênasekirin hewce ye di wî cihî de avahiyên mîna perestgeh, tiyatroyên antîk, kanî û bi taybetî jî agora (sûk) hebin. Sûk (agora) di demên antîk de tenê ne cihên danûstandinan bûn. Li gel danûstandina aborî, cihên nîqaşên felsefî, civakî, siyasî, olî, huqûqî û bi giştî cihên karên rojane bûn. A herî girîng jî em dikarin bêjin ku danûstandinên felsefî herî pir li van meydanên agorayê ango sûkê dihatin kirin. Sûk ne tenê bi armanca danûstandinên aborî hatibûn çêkirin. Êdî bi demê re her diçe wateya sûkan diguhere û bi giştî tenê wekî qadên danûstandina aborî tên bikaranîn.

Yek ji van cihên dîrokî jî Sûka Kevn a Kerboranê ya Mêrdînê ye ku 300-400 sal berê hatiye çêkirin. Me jî berê xwe da Sûka Kevn a Kerboranê (navê wê yên antîk wekî kherboran, Kher-Boran, Kfar-Boran, Kerburan e).

Li gorî agahiyên dîrokî Sûka Kevn ango Sûka Suryanan ji aliyên nîştecihên Kerboranê, suryan û kurdan ve di sedsala 17'emîn de hatiye çêkirin. Ji derdora jîngehên Kerboranê, gel ji bo bazirganî û danûstandinê berê xwe daye Sûka Kevn. Wek tê zanîn ku bi hezaran sal in li Mêrdîn û derdora wê rezên tirî hene û li vê derê ji mewîj heta helîl, bastîq û mey tên çêkirin. Kesên ji rezên xwe, tiriyê xwe daye hev û barê xwe yê tirî, genim, qumaşên ji binxet û Rojhilat/Îranê anîne avêtine ser pişta ker û hespan û berê xwe dane Sûka Kerboranê… Ji dema hatiye çêkirin ve, Sûka Kevn ji bo danûstandin û bazirganiyê; ji bo sektorên wekî karsaziya keviran, karsaziyên ku hesin li wan dihatin firotin û dikanên caman hatine bikaranîn.

Li Sûka Kevn, li gorî agahiyên nîştecihên vê derê didin ji sed dikanî zêdetir dikan hebûne lê niha tenê 50 dikan li ser piyan mane û herî dawiyê jî di salên 1980'yî de hatine bikaranîn. Niha jî ew dikanên ku bi kevirên kalker ên bi taybetî li derdora Mêrdînê ne hatine çêkirin, niha di nav rêxa sewalan de ne. Dema mirov li nav Sûka Kevn digere her çiqas sûk ji her alî ve bûye kavil jî, li ser deriyê hin dikanan hê jî navên hin terzî, berber û dikanên qumaşan hene.

Helbet piştî çêkirina sûkên nû êdî eleqe ji bo Sûka Kevn nemaye. Her diçe ew qerebalixa di kuçeyên sûkê de kêm dibe û di navbera salên 75-80'yî de êdî kesên dikanên wan li sûkê hene yek bi yek digirin û çawa ku suryan ji Kerboranê koç dikin, îro tenê du sê mal mayîne Sûka Kevn jî li hemberî koçkirin û êrîşan vala dibe û îro tenê kavilek e. Ev sûka ku berê xwedî kuçeyên qelebalix bû, di roja me ya îro de mixabin wekî sergo tê bikaranîn.

Li gorî agahiyên hin nîştecihên Kerboranê didin me, şaredariya Kerboranê demeke dirêj e qala xerakirin an jî restorekirina sûkê dike. Li ser vê agahiyê me xwest em bi şaredariya Kerboranê re biaxivin lê der barê mijara xerakirin an jî restorekirina sûkê de tu agahî neda me.